


# welat

Çapemeniyê  
3 caran  
Osman Öcalan  
kuşt



Rûpel 9

Sal:1 Hejmar:37 1-7 Mijdar 1992 5000TL (KDVD) Rojnameya Hefteyî

*Hefsarê pêşmerge di destê Tirkîyê de ye. Ordiya Tirk û pêşmerge bi hev re êrîşî ARGK'ê dikin*

## TC li pêla gerîla qelibî


Ordiya Tirk bi hêviya îmhakirina gerîlayan kete nav erdê başûrê Kurdistanê. Li gor planên bi xayînên Kurd re hatibûn amadekirin wê gerîlayên ARGK'ê bi operasyona "Sandiwic"ê ji holê rakirana. Bes, ordiya Tirk, hîna di rê de li hêza gerîla qelibî û derbên mezin xwar. Niha rewşa leşkerên Tirk dişibê ya leşkerên Amerîkî yên di Viyetnam'ê de telef bûbûn. Kumandariya Navenda ARGK'ê, ji rojnameya me re ev daxuyanî şand: "Nûçeyên ku dibêjin Haftanîn û Xakurk ketine destê Komara Tirk, bi temamî derew in. Em dixvazîn ku leşkerên Tirk bi nav hundirê başûr ve werin, lê ew bi pêş ve nayên. Ji ber ku ew dizanin pêştir ve werin, nikarin ji destê me bifilitin. Daxuyanîyên ku di rojnameyên Tirkan de dertên bi temamî, awayekî şerê psikolojîk e. Komara Tirk derbên mezin xwarine û tek diçe."

Rûpel 8

## Zimanê Kurdî li Sorbonê

Li Parîsê, li avahiya Sorbonê, Profesore bi nav û nîşan, Pierre Lecoq, wê isal semînerên xwe bi navê lêkolînên li ser fonetîk û morfolojiya dîrokî yên zimanê Kurdî û zarawayên wê bide. Semîner roja sêşemê, 17 Çiriya Paşîn 1992, dest pê dike ra (ta) dawîya meha Hezîrana 1993'yan.

Rûpel 11



Çi jin, çi mêr, çi ciwan û pîr, bi yek dengêkî, mil li mil; li ber xwe didin, êrîş dikin, dlmirin, jîyan diherike ji xwîna wan, kulîlk vedidin li newal, deşt û çiyayên Kurdistan.



Mem  
û  
Zîn

Rûpel 11



Karkerên  
Bazarvan

Rûpel 6



Goran  
û  
Paiz

Rûpel 13



# REWŞ



Abdullah Keskin

## Beyreq û al

Van rojan li Tirkîyê ji bo 29'ê Cotmehê, cejna Cumhuriyetê her der bi beyreqan dagirtine. Ev demeke dirêj e ku li metropolên Tirkîyê dijim lê tu çaran û tu salan dewletê ewqas mesref nekiribû û mal û sikak, cade û dikan ewqas bi beyreqa TC danegirtibûn.

Weke ku di rojnameyan de tê nivîsandin ev 20-30 roj e, wîlayetê kampanyek vekiri ye. Navê kampanyayê "ji her malekê re alek" e. Serê vê kampanyayê jî Kozakçioğluyê meşhûr û belediye dikşînin. Esas kampanya ji bo Kurdistanê vebûye û xebatên mezin li wir dibin. Îsal "Sümerbank"ê tenê pênc hezar beyreq ji bo ku li Kurdistanê belav bibe veqetandiyê. Gelek sazgehên dewletê yê din jî beşdarî vê kampanyayê dibin. Her rojname li pey hevdu li ser naylon û kaxetan beyreqan belav dike.

Berê li Kurdistanê ji bo xelkê Kurd, beyreqan bi mal û dikanên xwe ve bike cendirman bi çekan yek bi yek digeriyan û bi daîfê kotekê beyreqa TC incax bi dikanan ve dadileqandin. Heta niha çiqas insanên Kurd ji ber ku beyreqa Tirkîyê bi ser cam an deriyê xwe ve nekiriye, çiqas, çiqas insanên me tade dîtin, lêdan xwarin, îşkence û heqaret dîtin?

Li welatên me çiqas kêmasiyên insanên me hebin jî tiştin, tiştine gelekî girîng tu çaran nehatine qebûl kirin. Sînorên sînî ku gelê Kurd ji hevdu veqetandine, ew sînorên ku Kurdistan parçe

kirine, tu çaran qebûl nekiriye xelkê me. Sûriye ji bo Kurdên Bakur herdem "Binxet" e, Bakur ji bo Kurdên Sûriyê herçaxî "Serxet" e. Li aliyê din bakur "jor" e, başûr "jêr" e. Dagirkerên çar aliyan dînamîkên civaka Kurdan zêde tahrîb nekirine. Weke vê yekê beyrexa Tirkîyê tu çaran ji me re nebûye al. Hurmeta me ji ala her welatî û gelfî re heye. Lê bi zorê tu kês nikare ala xwe bi welatekî, bi miletekî bide qebûl kirin. Ne hewce ye ji!

Term û biwêjin hene. Di pêvajoya civakî û dîrokî de cihekî digirin û maneyek taybetî bi kar tînin. Wexta

**Ji bo çi xwe bi xwe dibin bûk û zava? Haya tu kesî ji wan nîn e û çavên tu kesî jî ne li beyreqa wan e. Ji ber ku êdî ew bi xwe jî fêm dikin ku tu meşruiyeta wan nema ye. Xwe bi xwe muhasebe dikin û dibînin ku dewleta wan herkesî temsîl nake. Ev beyreq û dewlet ne meşrû ne!**

mirov bixwaze wan wergerîne zimanekî din çênabe, wê maneya xwe ya taybetî winda dikin. Bê çawa cîhad û ceng nayên maneyekê (yek jê; cîhad, maneya wê gelekî bi sînor e, ji bo mumînan cenga ji bo Xwedê ye, ya din cenga normal e armanca wê textîl textîl e) beyreq û al jî nayê eynî maneyê. Cendirme û leşker, heta wilo bidome pêşmerge û gerîla jî, naye yek maneyê. Cendirme an jî bi dîtina gelê me "Amene qodum", ji vê peyva Tirkî, tade, heqaret û kuştinê pê

ve tiştek neda ye gelê me. Ji bo çi her malbata Kurd dixwaze zarokên xwe bike ebûqat an jî dixor? Bi zilma cendirme ve gelekî girêdayî ye ev pirs.

Pirs zêde ne. Ji vê yekê jî dixwazim vegerim serî. Heta niha kampanyayên daleqandina beyreqa Tirk li Kurdistanê dimeşandin û diceribandin. Berî bi salekê du salan, hê jî, çend kîlometre di ber Cudî de diçûn û li serê kaşikna beyreqa Tirkîyê diçikandin.

Tiştêkî xerîb di vê de nîn e, gelekî normal e. Çûnkî ev 70 sal in hê jî îşxala xwe nebirine serî û negihîştine amelên xwe. Hê jî biyanî ye, hov e TC li wî xakî. Tiştê xerîb û enteresan ew e ku îro li Tirkîyê dike. Mal û dikan û sikak dibin beyreqa xwe de winda dikin. Heta niha tiştêkî wilo nebû, îro ji bo çi ewqas zehmetî? Xelet neyê fêm kirin, ev tişt ne ji xwe ve çêdibin, an jî bi însiyatîfa xelkê. Vî karî tev de dewlet organîze dike û dimeşîne.

Ji bo çi xwe bi xwe dibin bûk û zava? Haya tu kesî ji wan nîn e û çavên tu kesî jî ne li beyreqa wan e. Ji ber ku êdî ew bi xwe jî fêm dikin ku tu meşruiyeta wan nema ye. Xwe bi xwe muhasebe dikin û dibînin ku dewleta wan herkesî temsîl nake. Ev beyreq û dewlet ne meşrû ne!

Li aliyê din insanên me ji paçikan, nexşan, ala xwe çêdikin û bi serê daran ve datînin. Ew zarokên ku di 29'ê Cotmehê de li ber walî, qeymeqam, polîs û cendirman diketin "esas duruş"ê de û ji repe repa lîngan toz bi ser wan diket îro ji bo serxwebûn û azadiyê dimeşin.

Ala rengîn, rengên xwe ji qozeqerê (keskeşor) digire. Piştî ewrên tarî û baranê re qozeqer derdikevin. Helbet rojekê em jî yê di welatê xwe de ala rengîn biçikînin û çiya û bajarên Kurdistanê bi kesk û sor û zer bixemilînin.

Qozeqera welatê me, ala rengîn, silav ji te re...

## FERHENGOK

- Berxik: Bêrx (kuzu)
- Bê guman: Bê şik (kuşkusuz)
- Bihar: (Bahar)
- Birdozî: Bîrûbawerî, felsefe, îdeolojî
- Cange: Conega, gayê ciwan
- Cawbir: (Bez dokumacı)
- Cirr: Mizaç, hûy
- Cirrxweş: (iyi huylu)
- Cirnexweş: (geçimsiz, kötü huylu)
- Delîve: Fersend, fîrset
- Demsal: Mewsîm
- Êzing: Dar, darik
- Gîsk: (nêriyê biçûk)
- Havîn: (Yaz)
- Hilbijêr: Seçmen
- Hogeç: Beranê ser c, beranê dijwar
- Încas: Erika reş
- Jûjî: Jîjo (kırpi)
- Kum: (kühah)
- Kaleşêr: Şêrê pîr
- Karik: (oğlak)
- Mijdar: (Kasım ayı)
- Mînik: Îdidok, pîrîk (kelebek)
- Nêrî: Bizina nêr (teke)
- Nogin: Çêleka ciwan (ineğin küçüğü)
- Payîz: (Sonbahar)
- Pêkûtî: Pest (Baskı)
- Serêsalê: (yılbaşı)
- Tebat: Aram, sebir
- Qijik: (karga)
- Qozeqer: Keskesor (gökkuşak)
- Tiştîr: Bizina hîrfa nezayî (doğurmamış keçi)
- Xefik: (kapan, tuzak)
- Xeml: (süs)
- Xemilîn: Edilîn (süslenmek)
- Xemlandin: Edilandin, delalkirin (süslemek, güzelleştirmek, donatmak)
- Xela: (Kıtlık)
- Zivistan: (Kış)

## Nameyek ji pêşmergeyên Başûr re

Ji şerman devê min nagere ku ez bibêjim pêşmerge, ji ber ku peyva pêşmerge tê mana kes û kesên ku welat û milletê xwe ji dijminan diparêze, kesên ku serê xwe ji dijminan re natewînin û nahêlin ku dijmin bi namûsa milletê wan bilize. Lê belê ez nikarim bêjim wan kesan ku tîvingê dikin sînga birayên xwe yê Kurd û dipeqînin (diteqînin).

Belê hûn bûnê wek robotan ku, çawa bêne programkirin wilo dilivin. Hûn ketine destê dijminên milletê Kurd. Gelo hûn carekê ji xwe napirsin ku vî şerî di ber çî de dikin? Gelo heta hûn devê çekên xwe bidin sînga gerîlayên azadixwaz; hûn bidin sînga dijminên xwe hin çêtir nîn e? Ew dijminên ku bi hezaran salan e bi namûsa gelê me dilîzin û xêr û berên welatê me dixwin. Ew dijminên ku welatê me parçe kirine û destê milletê me ji hew qut kirine.

Ma gelo hûn ji xwe napirsin ka mafê we heye ku gerîlayan ji xaka Kurdistanê derxin? Ew serokên we yê ku Ewrûpa ji xwe re kirine qonax, bi xwîna gelê Kurd kêfa xwe dikin. Qet derd nîn e ku çend kes ji we bêne kuştin. Dêrd wan ew e ku bi şerê birakujîyê çend aferin û peran ji Tirkîyê bistinin. Ma hûn ji xwe napirsin karê terorîstan(!) bê nan bê av li serê çiyayan çî ye? Ez nizanim eger di nêrîna serokên we de ev hêzên şoreşger û serxwebûnxwaz terorîst bin li gor milletê Kurd ev gerîla; şervanên serxwebûn û azadiyê ne.

Êdî bes e birakujî, bes e stemkarî, bes e nokeriya dijmin. Dest û milên xwe tevî çekên xwe bidin ên gerîlayên bakurê Kurdistanê û ji bo şerê û namûsê, ji bo azadiyê şer bikin.

Serfirazî ji bo milletê Kurd, ji bo şehîdên azadixwaz.

Perwer Shamoo / Russiya

## Divê Welat hefteyî be

Ez silavên xwe yê germî ji we re bi rê dikim, di xabatên we de, ji we re serkeftinê dixwazim.

Gelek spasî ji bo xebatên we yê hêja. Bi rastî her hejmarê rojnameya Welat ez wek pirtûkan dibînim. Welat ne rojnameyeke wisa ye ku mirov çend babetan jê xwend, piştî re bavêje. Ji serî heya dawiyê, her rûpelê wê yê xwendinê ye û bi qîmet e. Ji bo vî qasî bi zanîna min divê rojnameya Welat hefteyî dom dike. Di vê demê de bila nebe rojane. Lewre, di rojek tenê de mirov nikare tev bixwîne. Lê di demê dîr de, dike ku rojnameya rojane jî derkeve.

Çûyîna Apê Musa gelek mixab bû. Ew çiqas xweşik dinivîsand. Ew dikaribû hê jî gelek xebat bikira ji bo gelê xwe. Ji bo xaka xwe. Lê ew çawa gula dilê me û dostan bû, wisa jî kelemê çavên dijminan bû. "Tu tu car jî bir nabi Apê me. Qebra te ronî be. Tu xweş razê."

Gelî hevalan ez gelek silavan li we dikim û serkeftinê dixwazim. Herdem di nav xweşiyê de bin.

## Banga welatparêzên li Berlînê

Bi banga YRWK'ê roja 25.10.1992, li Berlînê, li ser bûyerên dawî, nêzikê 100 kes, ji hemû parçeyên Kurdistanê civiyan. Di civînê de daxuyaniyek ji bo raya giştî bi navê "Leşkerên Tirk derkeve ji Kurdistanê!" hate belav kirin. Di daxuyaniyê de li ser êrîş û tîkiliyên PDK û YNK'ê yê bi dewleta Tirk re tê rawestin û ev êrîş û tîkiliyên tîn protesto kirin.

Di dawî de ev daxuyaniyê bi van xalên jêrin tîn rêz kirin.

- Di bin çî mercan de be jî, wê serhildanên gelê Kurd berde-wamkin. Bila kes, qet bawer neke, ku karibe 30-40 milyon mirovên hişyar bi darê zorê bindest bihêle!

- Dewleta Tirk ya êrîşker û xayîn û xwefiroşên Kurd berpirsiyarên rijandina xwîna gelê me ne!

- Mesûd Berzanî û Celal Telabanî tenê nûnertiya xwe û ya malbata xwe dikin. Ew ne nûnerên başûrê Kurdistanê ne.

- Pêşmergeyên Başûr û Bakur bira ne û yek in. Ew şerê û namûsa neteweya Kurd diparêzin. Lewre em bawer in, ku ew xwe nakin maşê di destên dijminên huşdar û derve de. Em ji pêşmergeyên başûrê Kurdistanê dixwazin, ku ew milên xwe bidin milên gerîlayên qehreman û pê li dek û dolabên dijminan bikin. Neteweya Kurd yek netewe ye, Kurdistan yek Kurdistan e.

- Em bi qehremaniya gerîla gelek kêfxweş û serbilind in; bi piştgirî û serhildanên gelê me, serkeftin ya me ye.

- Em ji xêrxwaz û aştixwazên cîhanê hêvî dikin, ku li dijî hovîtiya leşkerê Tirk derkevin û piştgirîya serxwebûn û azadiya Kurdistanê bikin. Em ji cîhanê giştî re vekirî diyar dikin, heya ku neteweya Kurd bindest be, aştîya rast li Rojhilata Navîn pêk nayê.

- Daxwaza me ji hemû niştimanperweran ew e ku, bêdeng nemînin, li dijî îxanetê nerazibûna xwe eşkere bikin.

- Kurdistan ji dijmin re bûye goristan. Leşkerên Tirk derkeve ji başûr û bakurê Kurdistan!





## Kaniya Ehmedê Xani

Li Agirî, kaniyên ku ji alî belediyê ve tene çêkirin û navên ku li van kaniyan tên danîn, li xweşa pey-wirdarên dewletê naçe û dixwazin van navan biguherin.

Belediya Agirî, berî demekê çend kaniyan dide çêkirin û navê ya li cadeya Erzeromê, li gor daxwaza xelkê datînin "Xani Baba" (Bavê Xani).

Weke tê zanîn tirba Ehmedê Xani li Bazîdê (Doğu Beyazıt) ye û weke ziyaretgeha xelkê herêmê ye. Ehmedê Xani, di nav xelkê Serhedê de gelek tê nasîn û hez-kirin.

Lê ev navê ku li kaniyê tê da-

nîn, di nav belediyê û walî de dibe problem û walî İsmet Metin ji bo guherandina wî navî li Serokê Belediye Agirî Fevzi-Bulut pêk-tiyan dike. Walî İsmet Metin, piştî ku ev daxwaza wî nayê cih, îca ji bo tîpa (herf) "X" ku li navê Xani ye, astengan derdixê. Walî dixwaze ev tîpa "X" ku yek ji tîpên alfabeya Kurdî ye, bê guhertin, lê ev daxwaza wî ji tê red-kirin.

Di nav belediyê û walî de, navê Urfan Alpaslan jî dibe problem. Lewre navê Urfan Alpaslan jî li kaniyê hatiye danîn. Urfan Alpaslan, beriya 12'ê Îlonê, wek be-

rendamêkî serbixwe, ji bo Serokatiya Belediye Agirî tê hilbijartin. Urfan Alpaslan welatparêzêkî navdar bû. Ji bo Agirî gelek xizmetên girîng pêk ani bû. Urfan Alpaslan, piştî 12'ê Îlonê berê xwe dide başûrê Kurdistanê û li wir amadekariya ordiyek ji bo şerê çekdarî dike. Urfan Alpaslan di sala 1987 an de, li Bakur ji alî hêzên dewleta Tirk ve tevî gelek hevalên xwe tê kuştin. Lê xelkê Agirî wî ji bir nake û ji bo biranîna wî, navê wî li kaniyê datînin. Ji ber vê yekê ye ku, waliyê Agirî ji van herdu navan aciz e û dixwaze ev nav bîn guhertin.

## Bûyerên hefteyê

23 Cotmeh 1992- Li Dêrsimê, li Mezgirtê kontrayên dewletê ku cilê gerilayan li xwe kiribûn avêtin ser gundê Dedebox, pere û zêrên gundiyan jî wan standin û 12 gundî kuştin.

- Li Şirnexê gerîla êrişî ser tabûra Fındıkê kir. 23 leşker kuştin.

- Li Karakoçanê nêzikî gundê Sarıca, di nav hêzên dewletê û gerilayan de şer derket. 2 leşker hatin kuştin.

- Li Sasonê ji gundê Koçkaya gerilayan 3 cerdevan revandin.

- Li navça Stewrê li gundê Durusu gerilayan xayinêkî kuştin.

24 Cotmeh 1992- Li navça Hezêxê hêzên dewletê avêtin ser gundê Girîza. Gundiyan kom kirin, 5 gundiyan bi xwe re birin dervêyê gund, ji wan stargehên gerilayan xwestin. Gundiyan

stargehan nişan nedan. Leşkeran jî, ji wan 4 gundî qetil kirin. Li dijî vê qetlîamê, gundiyan Filê, Girîza û Hespistê meşîyan. Hêzên dewletê gelek gundî xistin, bin çav.

25 Cotmeh 1992- Di navbera Muşê û Elezîzê de gerilayan rêya tirênê tehrîp kirin. Tirêna leşkeran qelîbî û kete çemê Mûradê. 5 leşker û makinîstek mirin, 26 leşker jî birîndar bûn.

- Li Nisêbinê li Taxa Kışla milîsên şoreşger avêtin ser mala serokên hizb-î kontrayan Mehmet Beşer û wî kuştin.

- Li Motkiyê gerilayan ji gundê Xutê 15 cerdevan revandin.

- Li Edenê li taxa 19 Mayıs xayinêkî ji alî PKK'ê ve hate kuştin.

- Li navçeya Karakoçanê muxtarê gundê Çayır Güllü ji alî gerilayan ve hate kuştin.

26 Cotmeh 1992- Li Şirnexê li gundê Güneçamê di nav gerilayan û cerdevanan de şer derket. Cerdevanek û jina wî hatin kuştin, 2 jî birîndar bûn.

- Li Qarsê, li Dîgorê li gundê Varlı gerilayan xayinêkî kuştin.

- Li navçeya Hazroyê nêzikî gundê Çitlibahçe texsiyek ji alî cerdevanan ve hate gulebaran kirin. Ji yên ku di erebê de bûn yek mir, yek jî birîndar bû.

27 Cotmeh 1992- Li Ruhayê, li 4 cihî bombe teqîyan, banqeyek şewitî di destê tîmekî ku bombe îmhâ dikin de, bombe teqîya komîserek mir, 4 jî birîndar bûn.

- Li Çepeçqûrê (Bingolê) li nêzikî navça Gencê, di nav hêzên dewletê û gerilayan de şer derket. 2 leşker hatin kuştin.

- Li Batmanê li navçeya Kercesê, li Cimilê gerilayan 7 cerdevan revandin. Gerilayan riya di navbera Kercesê û Eskîfe birin ereba sekinandin, nasnama kontrol kirin û 4 cerdevan bi xwe re birin.

- Li Silopya pirek ji bo erebeyên leşkeran îkmal nekin ji alî milîsan ve bi bombeya hat xcrakirin.

28 Cotmeh 1992- Gerilayan li Şirnexê êrişî ser qereqola Altke-mer li Dihê (Eruh) yê ji êrişî 8 qereqola Tünekpınar kirin. Di van êrişan de 4 leşker dil girtin.

- Li Dêrsimê ERNK ya Eyalêta Dêrsimê belavok belav kir. Di belavokê de gotin: Her kesên ku dev ji welatê xwe berde û here emê dest bixin mal û erdê wan bi-din kesên feqîr.

## HAWAR

Dilbixwîn

### Eniya Serxwebûnê û mekanîzmaya şoreşgerî

Êlperestî û feodalîzma li başûrê Kurdistanê ziyan û zî-rareke mezin gihande gelê Kurd. Ev hêza paşverû rê li pêşiya ramanên nû girt û li hemberê modernîzmê û a-firandina tevgerên şoreşgerî mîna dîwarekî sekinî. Marksîzm qedexe kir û heya tu dibêjî bes, rewşen-bîrên Kurd ên welatparêz û şoreşger kuştin û dan kuştin.

Tu caran Kurdistan ne mîrata êl (qebîle), kes û eşî-ran e. Kurdistan, niştimana Kurdên wê diparêzin, Kurdên ku ji ber wê ve xwîna xwe dirijînin û di pazaran de nafirosin e. Ji lew re dema ku tevgera rizgariya ne-teweya Kurdistan derdikeve, tîrêj û rohniya xwe dide her çar parçeyên Kurdistanê. Bi taybetî jî li başûrê we-lat, ew başûrê ku heya niha xayîn û welatfiroşan ew bi dehan caran firotine. Başûrê welat vê tevgerê bi her du destan hem-

bêz dike. Mîna al-ternatîvekê ji kev-neperestiya se-rokêlan re dibîne.

Weke tê zanîn piştî kongreya PKK'ê ya 4 an li başûrê Kurdis-tanê, Partiya Aza-diya Kurdistan (PAK) damezirî. Damezirandina tevgera PAK'ê ji bo başûrê welat pêwistiya xwe ya herî mezin dibe.

Cara yekemîn e ku gelê me yê li başûr dibe xwediyê tevgerê wiha şoreşger.

Vê tevgerê; li ser bingeha avakirina Kurdistaneke serbixwe û azad gavê xwe ya pîroz avêt. Li hemberê şebekeya xiyane-tê rawestiya û diyar kir ku êdî xayînên dinyayê nikarin bi qedera başûr bilfizin.

Ji ber ku PAK xwediyê van taybetî û xisletên şoreş-gerî û welatparêz e, PKK piştgirî û alîkariya wê kir. Ji xwe di xaleke programa PKK'ê de heye ku, her parçeyekî Kurdistanê divê bi hêza xwe rabe ser piyan, li da-wiyê ew hêz dibin yek û meclîseke neteweyî ava dikin. Ji lew re PKK bû piştgirê PAK'ê.

1992, ber bi dawiya xwe ve diçe. Dewleta Tirk nefesa xwe ya dawiyê dikişîne. Her kes dibîne bi çi hovî-tiyê, F-104'an davêje ser şoreşgeran. Vê êrişê enca-meke serkevtî dernexiste holê, xayînên başûr rakirin, wan jî tiştê nekirin... Ket in, ket in, ket in... Li dawiyê tenê tevgera şoreşgerî bi ser dikeve.

Bila li gelê Kurd pîroz be, xiyane-ta heya niha veşar-tîbû, êşkere bû. Bi vê êşkerebûnê re têkoşîna rizgariya Kurdistanê derbasî merheleyeke nû bû.

Dîsa pîroz be.

Di 7.10.92 an de belavokek li Kurdistanê û li Ewropa bi sê zimanan hate belavkirin, ew belavok; belavoka damezirandina Eniya Serxwebûn û Azadiya Kurdis-tanê bû! Yekîtiya PKK û PAK'ê, xwe gihande dameza-rindina vê eniyê, li başûrê welat.

Ev enî alternatîveke li şûna eniya xiyane-tî ya ku ji bilî rev, hevxe-batkarî û dûvelankiyê tiştê neafirandi-ye.

Wê ev enî bersiva, "dê çawa xiyane-t were hilandin?" bide.

### Tetwan: 1000 girtî

Li dijî êrişên PDK û YNK'ê esnafên Tetwanê dikanên xwe girtin, şofêrên wê erebeyên xwe neşixulandin û gundiyan derdora Tetwanê jî, ber bi navenda bajêr ve meşîyan. Li ser vê yekê nêzikî hezar kesên welatparêz, ji aliyê hêzên dewletê ve hatin girtin.

Roja 27'ê Cotmehê, hemû esnafên Tetwanê kepengên xwe anîn xwar, şofêran jî kontakên erebeyên xwe girtin. Li hember vê protestoya gel, hêzên dewletê anons kirin da ku, esnaf û şofêr dev ji vê protestoyê berdin. Lê daxwaza hêzên Komara Tirk, ji aliyê bajariyan ve pêk nehat. Di eynî saetê de, ji gundan jî komên gel ketin rê û ber bi navenda Tetwanê ve meşîyan. Bêyî ku bikevin nava bajêr, pêşiya wan, ji aliyê leşkerên Tirk ve hate girtin. Piştî demêke kurt, hêzên dewletê ji gundiyan û ji na-venda bajêr nêzikî hezar kes girtin. Di nav van girtiyan de nûçe-vanê Kovara Özgür Halk Şeyhmus Gönüş jî hebû, dotîra rojê zehfên girtiyan û Şehmus Gönüş hatin berdan, nêzikî 40 kes jî di hundir de man.



# Sindroma Viyetnam xwe li nav leşkerên Tirk belav dike

## Yekda Welat

Bonn- Tirs, bê xewî, xewnên giran, xwêdan, lerizandin û şok xwe li nav leşkerên Tirk belav dike. Hinek leşkerên Tirk ku li Kurdistanê leşkeriya xwe kiribin, nikarin baş biaxifin, zimanê xwe winda kirine, zû diqehirin û hêrs dibin. Bê hejmar leşkerên Tirk ku li Kurdistanê şer kirine, îro ketine nexweşxaneyên psikiyatîrî. Ev leşker heta bi jîn wê nexweş bimînin û pirr ji wan mejiyê xwe winda kirine û dîn bûne.


Lêkolînek li ser vê nexweşiyê cara yekemîn di cenga cihanê ya duyemîn de hat çêkirin. Dawî ev nexweşî di şerê Kore û Viyetnamê de xwe baş diyar kir. Di şerê Viyetnamê de nêzîkî 104000 leşkerên Amerîka mejiyê xwe winda kirin û ji karê xwe derketin. Lê dewleta Amerîka bi fermî wan tiştan înkâr kir û digot ku ji bo sedema bêdîsîplîniyê ji karê xwe derketine.

Di her şerê gelan de ji bo serxwebûn û azadiyê sedem û armanca berxwedan û cengê pirr pêwîst e. Lê ma gelo leşkerên Tirk ji bo çî şer dikin?

Leşkerêkî Tirk hatiye welatekî dinê û bi hovîtî her roj qirkirinan çêdike û amade dike. Ev leşker bixwazin, nexwazin sedemêkî ku çima vê hovîtîyê dikin nabînin.

Leşkerêkî Amerîka ku li Viyetnamê şer kiriye, wiha dibêje: "Cenga li Viyetnamê şerê gerîla bû û me nizanibû kî gerîla ye û kî gundî ye. Carcaran bê sedem bi sedan zarok, jin û kale-pîr dihatin kuştin. Heta zarokên Viyetnamê bi her derfetên xwe li dijî me şer dikirin. Em têngihîştin ku çima em li vê derê li dijî wî gelî şer dikin."

Bîrdoziya (felsefe) hebûnê hînerî dide me, ku mirov bê sedem û armanc nikare bijî. Li aliyê dinê jî hinek xalên fizîkî hene, ku îflaskirina leşkerên Tirk diyar dike. Leşkerên Tirk her roj nikarin serbest rakevin û çiyayên Kurdistanê ji wan re pirr dijwar in. Leşkerên Tirk her roj mirina xwe li ber çavên xwe dibînin û tu car rîhet nabînin. Di vê demê de mejiyên wan (leşkerên Tirk) rastiya wî şerî nabîne û dest pê dike ji xwe re pirsirêkên şexsî li ser hebûn û tunebûna wî şerî di-



"Gehreman Mehmetçik" ji cenazên me ditirse. Ji bo tirsê xwe bişkinin îşkence li cenazan dikan, rexta li ser wan vala dikan û wan bi tîla girêdidin, bi panzeran dikişînin.

pirse. Rista leşker di wî şerî de bê mafî diyar dike. Nexweşiya psîkolojî dest pê dike û tendurustî (saxbûn) tune.

Leşkerên Tirk zehfên wan ji çîna karker û gundiyan Tirkîyê ne. Herwiha jî jiyana pêşerojê ya aborî û civakî ji wan re tariye. Dayik û bavên wan leşkeran birçî ne, jin û zarok bitenê ne.

Dema ku ev leşker vedigerin mala xwe nexweş in, lê kes li wan nabe xwedî, bê kar dimînin û di nav civakê de dibin

mirovên biyanî.

Sosyologê Fransî Emile Durkheim sala di 1987 an de dibêje ku mirovên bi pirsirêk tenê bi alîkariya kom û civakê dikarin dîsa sax bibin.

Lê alîkariya leşkerên Tirk tune. An tîna kuştin û kes li wan xwedî dernakeve, an jî dîn dibin û civak wan napejirîne. Dawiyê ev leşker bi qirêj û gomarî diçin gorê.

Figley û Leventman di sala 1980 an de hinek lêkolîn li ser wan pirsirêkan çêkirine û leş-

kerekî Amerîka ji wan re wiha dibêje: "Armanc ev bû, ku em dil û canê mirovên Viyetnam bikin destê xwe. Lê bi wêran kirina gundan me ev mirov kirin destê Viyetkong. Pirr caran em li ser hêz û qewetê difikirin. Me car caran di yek salekê de pênc heta şeş caran êrîşî ser gundekî dikir û wêran dikir... Agahiyên sixuran rast dernediketin... Gel û gerîla jî hev cuda nedibû. Bi wê wêrankirine gel (gelê Viyetnam) jiyaneke wisa kolektîv dimeşand ku tu kes nedîtibû. Dewleta me (Amerîka) alîkariyeke rastî ji me re nedikir. Di nav leşkeran de nexweşiya psîkolojî destpêkir."

Çawa li Viyetnamê hat diyarkirin ku şerê împeryalizm li dijî gelên bindest sernakeve û di nav leşkerên wan de sindromên psikiyatîrî wek bahoz belav dibe, îro wiha hatiye serê leşkerên Tirkîyê. Ev tirs û sindrom xwe di nav komên leşkerî yên biçûk û mezin de belav dike.

Gerîla dizane çima şer dike, lewra jî moralê wî heta şehîdbûnê bilind e. Mirina şehîdekî moral dide gerîlayên dinê û êşa ser wî şehîdî dikin moral û di pratîkê de, di karwanîyê de nîşan didin. Ciwanên Tirk înkâr dike ku Tirk e û dibe Alman, Fransî... Lê ciwanên Kurd ji Ewropa û welatên dinê vedigerin Kurdistanê û cihê xwe di nav refên gerîla de digirin. Mirov dikare rolê pêşmergeyan ku îro li dijî gerîla bi împeryalizmê re şer dike bi hinek kêmasî, wek leşkerên Tirk bibîne. Lê mixabin, ev şerê pêşmergeyan û gerîla nû ye û analîzkirina rista pêşmerge di pêşerojê de wê bibînin ku pirr caran ji nexweşiyên leşkerên Tirkîyê mezintir in û mirov dikare bêje ku ev dawîya hebûna pêşmergeyî ye. Ango ev nav jî hêdî hêdî dibe negatîf, wek KONTRA li Nikaragua, UNITA li Angola, ÎNCATA li Afrikaya-Başûr û hwd: (Lê divê nivîsandinek bi taybetî li ser rista gerîlayên Kurd û pêşmergeyan were nivîsandin)

Şerê Viyetnamê, Nikaragua û hwd. diyarkirin ku teknîk, çek û lojîstîk çiqas pêşketî be jî, nikare bawerîya gel ji azadiyê û serxwebûnê dûr bike. Her dem teknîk li hember bawerîyeke giran û hêja winda dike.

Îro gelê Kurd bawerîya xwe kiriye yek, armanc û sedemê berxwedana xwe nas dike û lewra bê guman serkeftin ya gelê Kurd e.

## GOTÎN



Yaşar Kaya

## Xwîna me xweş e

Ji şeş, heft meh berê ve heta niha, nivîskarê Tirk Uğur Mumcu û yên din ku neyarên xwîna Kurdan in, rê û rêçêk dabûn ber xwe, digotin: Gelo em çawa bikin da ku Kurdan bi hev û din bidine kuştin. Împeryalistê mezin zehf nêzîkê wan in.

Ew dersa xwe dizanin, tim û tim di bin emrê wan de ne. Ev xayîn van rojan ji bo tunekirina Partiya Karkerên Kurdistanê êrîşekê birin ser wan. Ger Partî di nav gelê Başûr de xurt nebe, gel li wan nebe xwedî, hîmê xwe li wir jî neavêjin, nikare li wir gavên xurt bavêje.

Berzanî û Telabanî bûne bendewarên Çankayayê. Gelo çima nafikirin? Dewleta Romê, ji bo Kurdên xwe çima tiştêkî baş nake, heqê wan nade, wan dike, sirgûn dike û çima bi me re dost û heval e? Lê belê ew van tiştan hemû dizanin. Dewleta Romê rê daye ber wan da ku ji Başûr ew êrîş bikin, ji Bakur jî leşkerên Romê. Bi vî awayî jî, heta qiyametê derkevin saxî û selametê.

Xwîna me şîrîn e. Çi dema Kurd bi hev ketibin, neyar pê şa bûye û ji bo

wan bûye roja cejnê. Di dîrokê de, ji nav Kurdan ceşqê kêm nebûne. Bûne neyarê qewmê xwe, bûne birakuj û hemû serhildan bi destê dagirkeran û bi alîkariya ceşqan tîk çûne.

Gelê Kurd, ev gazîkirina we ya leşkerên Roma Reş ji bîr nake. Ger Roma Reş bikaribe PKK ji navê rake wê, dor bê we, wê we jî tune bikin.

Me çend roj berê digot: Birakujî ne tiştêkî baş e. Bila rûnên, bi hev re bipeyîvin. Lê di ser van gotinan re gelek tişt

**Rom, berhevdanê rind dizane. Madem dostê Kurdan in, çima ji bo Kurdên li Bakur tu tiştî nakin? Dostaniya wan û Berzanî û Telabanî li ser çî ye? Divê gelê me van dek û dolaban rind bizanibe. Ev şer, ne şerê di nav Kurdan de ye. Rûyê van xayînan li Başûr jî eşkere bûye, êdî gelê Başûr jî wan rind nas dike.**

derbas bûne. Belê xwîna me şîrîn e. Ev çend sedsal in, li Kurdistanê neyar bi xwîna me dijîn. Dîroka Kurd û Kurdistanê, dîrokeke bi xwîn e. Şoreşa Kurdistanê bê xwîn nabe. Lê belê neyar kifş in. Kî li alî neyaran dixebite êdî ew jî kifş e.

Rom, berhevdanê rind dizane. Madem dostê Kurdan in, çima ji bo Kurdên li Bakur tu tiştî nakin? Dostaniya wan û Berzanî û Telabanî li ser çî ye? Divê gelê me van dek û dolaban rind bizanibe. Ev şer, ne şerê di nav Kurdan de ye. Rûyê van xayînan li Başûr jî eşkere bûye, êdî gelê Başûr jî wan rind nas dike. Ew mîlîtanên welatparêz ji bo welat çî dikin û yê din çî dikin, rind tê zanîn. Bila bê zanîn ku, êdî bi ceşqîyê û bi hevkarîyê ne welatparêz diqedin û ne jî ev doz disekine.

Demirel, ji vir heta Pakistanê, pê li derê cînanan dikute, dibêje alîkariyê bidin min ku ez PKK ê ji navê rakim. Ji Pakistanê heta Îranê, destê xwe vekirîye, li wan lava dike û alîkariyê dixwaze. Dibêje: Hûn bikaribin qewlekê bidin min, ezê çendekî din biçim Sûriyê, ji wir jî biçim Iraqê, ezê pakteke mîna CENTO'yê çêkim. Êdî bila serê me ji bo mesela Kurd neêşe, ev sedsal in, serê kîjan cînarê me li ser mesela Kurdî eşiyabe, me alîkarî dayê. Ger hûn jî alîkariyê nedin me û bidin Kurdan û PKKê, wê serê me giştan bêşê.

Derî bi derî digere, dixwaze zincîr û qeydên ku li piyên gelê Kurd in, bijidîne. Şîretan dide Îranê û Sûriyê. Ger ji wan piştgirî bigire, wê biçê ba Sedam jî û wê pê re li ser maseyêkê rûnê. Gelo çend roj berê, ew mirovên Sedam çima hatibûn Tirkîyê? Ji Tirkîyê hin daxwazan dikin. Dixwazin Hêza Çalak ji herêma derkeve ku ew jî bikaribin qira Kurdan binin.



## Hilbijartina IHD'ê

Komeleya Mafên Mirovan (KMM. IHD) kongreya xwe ya çaremîn çekir.

Di kongreya xwe ya çaremîn de ku li Enqerê, di 25.10.1992'an de çebû; ev kes ji bo rêvebiriyê hatin hilbijartin.

Ji bo Serokê Giştî, Akın Birdal, ji bo Sekreterê Giştî yê Komeleya Mafên Mirovan, Hüsnü Öndül, ji bo Cihgirên Serokên Giştî; Ercan Kanar, Yavuz Binbay. Yusuf Alataş û Fevzi Veznedaroğlu ji bûn Cihgirên Sekreterê Giştî û Yaşar Seyman ku bi xwe sendikavan e bû Hejmarvanê (sayman) Giştî.

## Zanîngeha Azad

Li paytexta Tirkîyê, li Enqerê, zanîngeheke serbixwe bi navê Zanîngeha Azad, roja 26'ê Cotmehê vebû.

Rektorê Zanîngeha Azad Yalçın Küçük, dekanê wê jî Fikret Başkaya ye.

Rektorê Zanîngeha Azad Dç. Dr. Yalçın Küçük, fakulteyê bi dursa "Dirok û felsefeya zanîstê" vekir. Nêzîkî 100 kes beşdarê wê dersê bûn. Mamosteyên ku di wê zanîngehê de wê peyvir bistînin ev in: Dr Celîlê Celîl, Cemşîd Bender, Akif Kurtuluş, Ali Yıldırım, Hüsamettin Çetinkaya, Sırnî Öztürk, Feqe Hüseyin Sağnıç, Emin Karaca, Bilgesu Erenus, Aburrahman Durre û A. Kerem Çepî.

Di nav dersên Zanîngeha Azad de, bi alîkarî û piştgirîya Navenda Çanda Amed û Navenda Çanda Mezopotamya wê dersên Kurdî jî bi navê "Avahiya Zimanê Kurdî û Rindnivîsandina Zimanê Kurdî" bên fêrkin.

Mamoste İsmail Beşikçi jî Rektorê rûmetî yê Zanîngeha Azad e.

## Girtiyên Şirnexê hatin berdan

Dadgeha Ewlekariya Dewletê (DGM) a Diyarbakir, ji 23 kesên ku ji bûyerên Şirnexê berpirsiyar girtibûn, 22 kes tahlîye kirin. Ev kesên girtî, ji xerakirin û wêrankirina Şirnexê berpirsiyar dihatin dîtin û dozger (savcı) der heqê wan de îdam dixwest.

Dozger hemû îdiayên xwe li ser îfade Şeref Zeyrek ku di bin çav de, bi zora îşkencê ev îfade dabû, amade kiribû. Şeref Zeyrek hemû îdiayan red kir û got: "Min ev îfade ji ber îşkence polîsan îmze kiriye, hemû senaryoyên polîsan in."

Weke tê zanîn, hêzên dewletê piştî ku Şirnexê bi tanq û topan wêran kirin, bi sedan însan kirin bin çav da ku bikaribin xwe ji wê tewanê (sûc) xelas bikin. Lê piştî ku ji bilî yekî, hemû girtî hatin berdan, baş xuya bû ku, tewandarê bûyera Şirnexê kî ye.

# HEP li her derê xurt dibe

## Murat Ergin Salih Günbat

Li Tirkîyê di 1'ê Mijdarê de, li hinek navçeyan hilbijartina belediyê heye. Partiyên burjûwa û serokên wan tev de ketine amadekariyê mezin. Partiya Keda Gel jî, ev-cara yekemîn e ku wê bikeve wê hilbijartinê. Hikûmet û partiyên din yê burjûwa di wê hilbijartinê de ketine şerê prestîjê.

Hikûmet ji bo bibêje "Wa ye gel bi me ewle ye, me dixwaze" di hilbijartina belediyan de bi ser bikeve. Mixalefet jî, li dijî koalîsyonê dixwaze rewşa xwe baş nîşan bide.

Li aliyê din, Partiya Keda Gel jî, li ser wê hilbijartinê dixebite. PKG ji bo propogandayê û xebatên hilbijartinê, Serokê xwe Ahmet Türk û mebûsên xwe Zübeyir Aydar, Mahmut Alınak, Leyla Zana, Nizamettin Toğuş û Orahman Doğan şandin Stenbolê. Hinek mebûsên xwe jî şandin İzmir û İzmirê. Li Stenbolê PKG li navçeyên Bağcılar û Güngörenê mitîng çekir. Ev mitîng bi coşî derbas bûn. Em li Güngörenê, li buroya hilbijartinê ya PKG'ê bi Sekreterê P.K.G Ahmet Karakaş û berendamê PKG'ê Ali İncesu yê navçeya Güngörenê re li ser hilbijartinê axivîn. Ahmet Karakaş, li ser hilbijartinê û poli-

tîkayên xwe wiha digot. "Ev cara yekemîn e ku em dikevin hilbijartinê, kadroyên me di vî warî de bê tecrûbe ne. Ji ber wê yekê, belkî hinek dijwarî derkevin. Lê em ne bi çavên partiyên din li hilbijartinê dinêrin. Partiya me, wekî partiyên burjûwa ji xelkê re tiştên vala nabêje. Em biratiya gelên Tirk û Kurdan dixwazin.

Di mitîngen xwe de biratiyê, aştiyê, tînin zimên. Bi rastî jî, di xebat û propogandayên hilbijartinê de me tu reaksiyonek ji gelê Tirk nedit. Em bi mebûsên xwe dikan dikan, li Güngörenê geriyên. Esnafên Güngörenê me bi germî qebûl kirin. Qey ew esnaf wê tev rayên xwe bidin me? Na belkî gelek ji wan rayê xe nedin me jî, lê tîkiliyên me yê germ nîşan dide ku gelê Tirk wekî ku çapemenî û televizyonên dewletê dibêjin ne dijminê me ye. Esnaf, xelk jî me dipirsin PKG (HEP) çi ye? Hûn çi dixwazin? Ya rastî Tirk partiya me ewqas nas nakin. Di wê hilbijartinê de, em bi ser nekevin jî, ne girîng e. Tiştê girîng ewe ku wê gel çiqas destek bi de me. Ji rayan jî sedî şeş para me bikeve bes e. Tiştêkî din jî; TV û çapemeniya Tirk weke ku PKG nakeve wê hilbijartinê, di nûçeyên xwe de qet qala me nake, ev jî

durûtî ye. Li aliyê din, di wê hilbijartinê de gelek kesên Kurd, ji RP (Paritiya Refahê) û SHP'ê veqetiyên û destê xwe dane me. Ji ber wê yekê jî RP dixwaze nexweşiyên derxîne, lê em bi xweşikahî diçin ser wan." Berendamê Serokatîya Belediya Güngören Ali İncesu jî, li ser hilbijartinê wisa got. "Em weke partiyên din, ji xelkê re nabêjin emê ji we re bexçeyan çekin, emê nizanîm riyên çekin. Em dibêjin, emê karê belediyê bi gel re çekin, pirsgirêkên ku hebin jî emê bi hev re çareser bikin.

Mesela; berhevkirina gemarê didin şirketên teybetî, îhaleyên mezin didin mutahîdên naskiriyên xwe.

Di dîtina belediya me de ev tişt nîn in. Em dixwazin di dema jî bo biryarstendina xebatên belediyê de gel jî bibe



Ahmet Karakaş Sekreterê Giştî yê HEP'ê



Ali İncesu Berendamê HEP'ê yê Güngören'ê

xwedi deng. Em dixwazin di civînên îhaleyên mezin de, xelk jî hebe û ev civîn ji herkesî re vekirî bin. Bi rastî ev hilbijartin, ji bo Partiya Keda Gel ceribandinek e. Ji ber ku ev cara yekemîn e PKG, dikeve hilbijartinê. Lê çî endamên PKG'ê, çî jî mebûsên wê li taxa, malo malo digerin û dixebitin. Her tişt wê di encama hilbijartinê de derkeve holê."

## Armanca geştê Demirel


Demirel, ji bo ku tîkiliyên Tirkîyê bi Pakistan û Îranê re xurt bike dest bi geştê kir. Geşt di 23'ê Cotmehê de dest pê kir. Ev geşt çar roj domiya. Rawestgeha yekemîn jî Pakistana M. Ali Cinnah bû. Dû re jî Îran.

Her çiqas Demirel di daxuyanîyên xwe de armanca wê geştê bi

awayek aborî û ticarî dide nîşan jî, mebest şikandina tevgera azadî ya gelê Kurd e. Dewleta Tirk ne niha, ji berê ve ji bo tîkîkirina tevgera gelê Kurd, peymanan bi dewletên cînarên xwe re çekiriye. Dijberî û nakokî jî bo helkirina gelê Kurd qet girîng nîn e ji bo wan.

Demirel dîsa li pey avakirina mîna Pakta Bexdayê û CENTO'yê ye. Dîsa dixwaze bi dewletên herêmê re ji bo helkirina gelê PKK'ê peymanan bi Pakistan, Îran û Sûrî re heta ku ji destê wan bê, bi Sedam re jî çekin.

Vêca dewleta Tirk ne tenê bi dewletên Rohilata Navîn re bi Berzanî û Telabanî re jî wê peymanan ku dixwazin bike kiriye. Divê dijminên gelê Kurd wê yekê bi bîr binin ku hem Kurdistan û hem jî gelê Kurd serokatîya xwe ya hemdem dîtiye. Tu hêz û qewet ne dikare serokatîya gelê Kurd tîkî bibe û ne jî dikare bi peymanên nû doza mafdar bide sekinandin.



Serokwezîrê Tirkîye Süleyman Demirel

## Girtinên kêyfi

Şaxê Têkoşîna bi terorê re li Stenbolê berî demê operasyonê çekir. Di daxuyanîyên xwe yê jî bo çapemeniyê de qala gelek endamên PKK'ê kirin ku hatine girtin û gotin di malên ku girtin ser wan de bêhejmar fişek, 2 keleşkof, 3 tiving, 2 demançe, 223 lib bombe, 12 lib guleyên roketavêjan, 10 lib guleyên sevkê, ji bo amadekariya radyoyekê hin malzeme, 3 telefon, mora partiyê, 4 nasnameyên sexte û dokumanên partiyê.

Di dawiyê de derket holê ku bidestxistina ewqas malzeme û dokuman tev derew in. Ji girtiyên Yaşar İnce wê rewşê wiha anî zimên "Piştî me girtin bi 12 roj şûn de polîsan em anî malê û komek sîlah, dokuman û tişt miştên wiha li malê raxistin. Di nav van sîlahên ku raxistin de bombe jî hebûn. Dû re tevî van sîlahan rismên me kişandin."

Ev rewş bi vî awayî û bi alîkariya çapemeniyê pêşkêşî raya giştî bû. Bi van senaryoyên derewin gel dixapînin û ji xwe re moralekî sîni çê dikin.

Di wê operasyonê de 26 kesên ku girtin ev in: Osman Tim, Mehmet Bahri Kurt, Cengiz Oğuz, Abidin Karakurt, Ramazan Harmancı, Enver Elbat, Vahap İnce, Selma Batmaz, Nibel Genç, Serpil Ertik, Ercan Narin, Ercan Yiğit, Ali Ekber Öz, Yedigir Çalşkan, Kıymet İlk, Mehmet Atik, Gülsen Şahin, İbrahim Yaman, Mehmet Yaşar İnce, Yılmaz İnce, İrfan Bilgen, Tarık Özcan, Eyüphan Sönmez, Arif Çağlayan û Halil Salık.



Bi karkerên bazarvan ên Stenbolê re hevpeyvîn

# 'Welatê xelkê nabe welatê mirov'

**Bazarvanên Kurd dibêjin: "Em baş zanin ku, ne axa xelkê, ne jî welatê xelkê dibe welatê mirov. Polîtîka dewleta Tirk jî li hember me çiqas diçe xerabtir dibe. Em bazarvan jî, tiştêkî me yê ku em winda bikin tune. Ji ber van sebebên, em li hêviya vegera ber bi welêt in. Heta niha gelek jî me çûne jî."**

*Di destpêkê de hûn dikarin rewşa jiyana xwe binin zîman?*

Eli: Bi rastî, ku tu bivê ez bêjim, rewşa jiyana me, li vê derê, kambax e. Ger tu aliyê aborî dipirsî, ferq di nav bazarvanan de heye. Beriya pênc-şêş salan, belediyê ev cihê ha da me. Ewîlî, jî aliyê aborî ve kar ê me bû, lê niha kambaxî ye. Em ne dikarin dev jê berdin, ne jî dikarin xwe li ser xweyî bikin. Rewşa hevalên ku li ser erebokan fêkî difroşin, Kekê Cemal jî min çêtir dizane. Bila ew wê bîne zîman.

Cemal: Ezbenî, ma ez çi bêjim, çawa heval gotê, kambax e, êdî ya me kambaxtir e. Em jî serê sibê heya derengê şevê dişixulin. Ne roj roja me ye, ne jî şev şeva me ye. Bi vî miqamî, bi kotek û heft bela em xwe xweyî dikin. Zilm û zordariya polis û zabitayên belediyê rewşa me hîn diwartir dike.

*Hûn jî kengê ve hatine*

*Stenbolê?*


Eli: Ev pazdeh sal e ez li vê derê me. Zehfên hevalên me ev deh-pazdeh sal e ku hatine Stenbolê û vî karî dikin. Lê, heta niha me jiyanekê bi rêk û pêk û hêsan bi dest nexistiye.

*Bi vî awayî heya kengê hûnê karibin dom bikin?*

Eli: Em baş zanin ku, ne axa xelkê, ne jî welatê xelkê dibe welatê mirov. Polîtîka dewleta Tirk jî li hember me çiqas diçe xerabtir dibe. Em bazarvan jî, tiştêkî me yê ku em winda bikin tune. Ji ber van sebebên, em li hêviya vegera ber bi welêt in. Heta niha gelek jî me çûne jî.

*Têkiliyên we bi Tirkan re çawa ne?*

Cemal: Zehfên Tirkan me wek gerilayên PKK'ê dibînin û bi çavêkî ne baş li me dinêrin. Radyo, televîzyon û rojnameyên wan bi şev û roj propaganda nijadperestiyê dikin û vê nijadperestiyê dixin mejiyê Tirkan. Ku ne jî mecbûrî bûya,



*Em jî serê sibê heya derengê şevê dişixulin. Ne roj roja me ye, ne jî şev şeva me ye. Bi vî miqamî, bi kotek û heft bela em xwe xweyî dikin. Zilm û zordariya polis û zabitayên belediyê rewşa me hîn diwartir dike.*

wê tu tişt jî me nekirriyana.

Lê yên baş jî hene, dibêje: "Em hemû birayê hev in." Lê em nizanin, çiqas jî dil dibêjin.

Zengînen wan bi xwe qet jî me tiştêk nakirrin. Ew diçin cem manavan.

*Hûn dikarin ramanên xwe li ser têkoşîna ku îro li Kurdistanê dimeşe, ji me re bêjin?*

Eli: Bazarvanên Kurd ên vê derê %99 dilxwaza têkoşîne ne û baweriyê pê tinin. Êdî baweriyê bi xwe jî tinin. Ku ne jî têkoşîne bûya wê kesî nikaribûya bigota


"Ez Kurd im" jî. Me xwe bi têkoşîne nas kir. Bi tu awayî, kes nema dikare nasnameya me winda bike. Em bi têkoşîne serbilind bûn. Gelê me giş rîya xwe nas kirîye. Ji ber vî aliyê me, herdem çavên polîsan li ser me ye. Yanê em herdem di bin taqîba polîsan de ne. Lê di ser me re avêtiye, bedel çi be, em razî ne.

*Di dawiyê de li ser xwendina rojnameya me Welat û peyvandina bi Kurdî hûn dikarin ramanên xwe binin zîman?*

Eli: Min ne xwendiyê û

ez neçûme tu dibistanan. Bi serê xwe ez hînî tîpên Tirkî bûm. Niha ez dikarim bi Tirkî bixwînim. Em rojnameya Welat jî distînin, lê bi rastî ez nizanîm bixwînim. Hinek herf tê de hene wan nizanîm. Nivîsandina Welat ne wek peyvandina devkî ye. Ez bawer dikim zehfên bazarvanan jî welê difikirin. Lê dîsa jî em divê xwe pê re biêşînin û em fêr bibin. Ku hûn jî herfên Kurdî di rûpelekê de binivîsin emê zor (pîrr) kêfxweş bin.

*Hevpeyvîn: Zeki Beyazıt*



*Beriya pênc-şêş salan, belediyê ev cihê ha da me. Ewîlî, jî aliyê aborî ve kar ê me bû, lê niha kambaxî ye. Em ne dikarin dev jê berdin, ne jî dikarin xwe li ser xweyî bikin.*





Bijî Tirkîye,  
Bijî Özal

Mesûd Berzanî

# Kak Samî Abdurrahman û bazirganiya wî ya erzan

Di roja 12'ê Cotmehê de (Oktober) Samî Abdurrahman hat Enqereyê û bi Wezîrê Karê Derve yê Tirkîyê yê cahş Hikmet Çetin re bazariya şerê PKK'ê kir. Ev bazariya di çapemeniya Tirkîyê de bi sansasyonel belav bû. Diyar bû ku S. Abdurrahman bi Hikmet Çetin re bazariya xwarin û derman kiriye. Hikmet Çetin daxwaza S. Abdurrahman qebûl kiriye û soza du kamyon kartol û 10 karton derman daye wî. S. Abdurrahman hin li Enqerê telgrafekê ji serokatiya partiya xwe re dişeyne û di telgrafa xwe de dibêje:

-Li gel Tirkan peyman pêk hat. Zû çensed

pêşmergeyan bişeynîn şerê PKK'ê...

Li ser vê peyman û bûyera S. Abdurrahman xelkê Amedê li ser wî helbestek çêkirin. Ev helbest wiha ye:

Ji serokê Başûr Kak Samî Abdurrahman  
Kerem kir hat Enqerê paytextê dostekan  
Lî gel Hikmet Çetinê xwefiros wezîrê Tirkan  
Firoto Başûr û Bakur gelek erzan  
Bi du kamyon kartol û deh karton derman  
Ji Enqerê telgrafekê kişand meqereke pêşmergeyan  
Got "geli hewrêkan ê me peymanê çak pêk anî  
Zû birêkin sed pêşmerge bo şerê PKK!"

## Amîgo Mesûd

Lo Mesûd Berzanî,  
gelo tu dizanî  
te çiqas pêşmergeyên Qasimlo  
li ser gora bavê xwe danî?  
Belê em dizanibûn  
Tu di wî warî de  
xwedî tecrûbe û huner î  
û piçek bi Îngilîzî jî dizanî  
lê, zîrekê zîrekan  
te ve amîgotî jî ku deranî  
"Bijî Tirkîye û Berzanî"  
Bimire Kurd û Kurdistanî."  
Ma tu serokê Kurdan î,  
an jî amîgotê Tirkan î?



## Gerîlayek û "tiştên bûna ronakbîrêkî"

Nedîm, rojnamevanekî Kurd, di Rewşenê (hejmar 8) de van gotina di derbarê gerîlayan û ronakbîran de nivîsandî: "Rewşenbîr ne tenê nivîskar in, belê wiha şervan in jî. Rewşenbîrên herî mezin ên vê rojê gerîlayên serxwebûn û azadiyê û serleşkerên wan in. Ji ber ku ew tenê bi temami dikarin bibêjin; em azad in, em serbest in".

Gotinên biraderê rojnamevan tev rast in, lê hemû ronakbîr ne wisa ne, bi taybetî jî ewên ku jina Ewropa ji xwe re xweş dîtine. Em dixwazin di vê gotarê de li ser wan bisekinin.

Em ji van ronakbîrên ku "şervan" in nimûneyekê nişan bidin. Çetire em wî bi nav nekin. Xwedêgiravî nivîskar bû û xebatkar bû jî. Dewleta Tirk berê wî kirine zindanê jî. Hikmê xwe di zindanê de temam kir û di sala 1977 an de hate Ewropa. Di wê navê de, şerê çekdarî yê gerîlayên ARGK ê dewleta Tirk anî îmanê. Dewleta Tirk, êdî bi saya şerê gerîla, rê da ku kovar û pirtûk bi Kurdî werin çapkirin, nivîskar û ronakbîrên me bikaribin veqerine welêt. "Ronakbîrê" me jî xwest, ku ji Swêdê here welêt da ku semînerêkê bide. Li gor gotina wî, Swêd 4.000 km jî welêt dîr e! "Camêr" dibê qey ("wekî bêje) pîvaye! Gava xwest vegere, vekar dewleta Tirk wî bernade. Dibêjin: Heyran, li vir be, em te nakujin. Tu çi yî? Em nikarin xwe ji şerê gerîla xelas bikin. Milet tev; zarok, pîr, ciwan û jin ketine şoreşê,

PKK şoreşê gihandiye serî. Tuyê herî Swêdê çi bikî? Pa (ma) Swêd welatê te ye?

Ma di wê demê de millet di Newrozê de ranebû piya, dewleta Tirk bi tanq û topan êrişên xwe birine ser Kurdan. Min got xwe: "Ronakbîrê" me evqas sal li Ewropa bê fêde û bê xebateka rastî qedandîye, vê carê wê heqê wan salan gişî vede, wê here hunerekî nişan bi de û navê xwe û rûmeta xwe dîsa bistîne! Min bawer dikir ew jî wê weke xwişka Leyla Zana, kirivê Ismail Beşikçi, Apê Musa Anter û xebatkarên mayîn têkeve greva birçibûnê û şerê dewleta Tirk bike. Greva çî û halê çî, "ronakbîrê" me li derketina welêt heyirî bû, welat ji bîra wî çûye, çûna Swêdê ew xwariye, bi wî şerîna bûye. Berê, dewleta Tirk ew daye revandin, niha ew bi xwe welêt dihêle û direve. Ewropa hin rewşenbîrên me wiha kirine. De erdo biqelişe û "ronakbîrên" wiha bila têkevinê.

Derdê kû mirov dikeve û nakuje ev e: Hikûmeta Swêdê van rojan ew kire "Tiştêk" jî. Di vê barê de, gotina apê Osman Sebrî tîye bîra me: Kî ji me bêhtir dikare peyatiyê bike, xelk wî dikine berpîrsiyar; û peyayên ku peyatiyê jî nakin, vêca radibin gerîlayên me, dikujin.

Trajediya milletê me jî mîj ve wiha bûye: Gerîlayên me şehîd dikevin, parek jî ronakbîrên me jî dibine "berpîrsiyar"!

Zîna Şikakî

## TÎR

Musa Anter



### Bavê min ê delal

Ji hinga ku tu şehîd bûyî, gelê Kurd ji bo te di rojnameyan de gelek tişt nivîsîn û xort, keç zarok û mezin giş van nivîsan dixwînin û te bibîrtînin.

Lê kesek nikare te bi temami binivîse. Ez jî niha zehf di zorê de me. Ezê te çawa binivîsim?

Tu di jiyana xwe de, her tim bi evîneke mezin li gelê Kurd xwedî derketibûyî. Te nedixwest pozê yek Kurdekî xwîn bibe, yan lingê yekî li kevir bikeve. Kîjan Kurd bihata mala te, nan û av bi keda te dixwar. Te heta 77 saliya xwe, li her derî, bi şev û roj bi pênûsa xwe têkoşîn da û te nivîsî. Westan ji bo te nîn bû. Te dev ji doza Kurdistanê berneda. Tu hem bûy rêberê civata xwe û hem jî têkoşîna xwe roj bi roj bilindtir kir.

Te di dadgehan de, bersiva dadgerên (hakimên) TC'ê bi ken û henek dida.

Dadger:

Musa Anter!

Rabûyî pê:

Belê ez im.

Tu Kurdçî yî?

Belê ez Kurdçî

me. Tu ez ne nivîşkîroş im!

Mirovên ku di dadgehê de rûniştîbûn û hevalên te (49 kes)

giş kenîyan... Te bersiva xwe giş bi henekên wilo derbas kir. Tu mamosteyek pîr mezin bûy. Tu di dîroka Kurdistanê de, weke derwêşek porsipî û filozofê me bûy.

Ez nikarim bawer bibim bi şehadeta te, naxwazim bawer bikim.

Ez dema li fotografên (wêne) te mêze dikim, ji min re wisa çêdibe ku tuyê bi min re biaxivî.

Dîroka me bi xwînê hatiye nivîsandin. Doza me, dozeke mezin e. Emê serfiraz bibin. Dê rojek zarokên me, di dibistanên me de, bi zimanê dayîka xwe bixwînin. Emê kincên xwe li xwe kin û dê keç û xortên me govenda serfiraziyê bigirin. Emê çanda xwe hîn bibin. Emê Mem û Zînê, Dîwana Mele Ehmedê Cizîrî Evdalê Zeynikê... û hwd. bixwînin.

"Ezê neviyê xwe jî bizewicînim, ezê 10 salên din jî bi-jîm!"

Dijminên xwînaxwar bi vî biryara te zanibûn gelo? Wan, ew 10 salan ji bo te pîr dîtin. Êdî sebra wan nemabû ku te di nav civata Kurd de tim û tim bibînin. Ew dijminên xwînaxwar nedixwestin tu biaxivî û der û dora xwe bi doza xwe bihesinî.

Tu kevoka aştiyê bûy. Lê ew ji aştiyê fêhm nedikirin. Bi gotina te "Ahmaktîrlar." Ji ber vê yekê, ew bi lez û bez, di şeveke tarî û di nav kuçeyên Amedê de, bi fendeke mezin tu şehîd kirin.

Gelo, te çî difikirî? Nehat bîra te ku bizivirî? Tu qet neke-tî şikê?

Xwezî çend salên din jî jiyana te hebûya... Tu 10 salên din jî di nav me de bimay.

Te digot: "Keça min! Barê gelê Kurd giran e. Emê hêdî hêdî bimeşin... Ez carna bi şev radibim û êdî nikarim rakevim. Dibêjim kur û keçên min, niha li serê çiya nin, gelo halê wan çî ye?"

Tu Kurdek wisa delal bûy ku, te canê xwe, malê xwe, pênûs û zanyariya xwe, ji bo Kurdistanê feda dikir.

Lê ez çî bêjim? Bavê delal! Tu bi mîrxasî derketibûyî meydana cengê, te ji bo ronahiyê, serfiraziyê û ji bo welatekî serbest û azad şer dikir. Lê dijmin van tiştan nedixwest. Destê xwe yê pîs û gemar li xwîna te ya delal xistin.

Ez ne bawer im ku tu şehîd bûyî!

Ew dengê te yê germ, tim di guhê min de ye...

Te evîn û têkoşîneke mezin da me...

Emê vê têkoşînê, roj bi roj bilind bikin...

Em tu caran te ji bîr nakin.

Yurda Kaya



Hefsarê pêşmerge di destê Tirkiyê de ye. Ordiya Tirk û pêşmerge bi hev re êrîşî ARGK'ê dikin

# TC li pêla gerîla qelibî

Kumandariya Navenda ARGK'ê, ji rojnameya me re ev daxuyanî şand: "Nûçeyên ku dibêjin Haftanîn û Xakurk ketine destê Komara Tirk, bi temamî derew in. Em dixwazin ku leşkerên Tirk bi nav hundirê başûr ve werin, lê ew bi pêş ve nayên. Ji ber ku ew dizanin pêştir ve werin, nikarin ji destê me bifilitin. Daxuyaniyên ku di rojnameyên Tirkan de dertên bi temamî, awayekî şerê psîkolojîk e. Komara Tirk derbên mezin xwarine û tîk diçe."

**Navenda Nûçeyan-** "Em kozikên (mewziyên) PKK'ê bi tu awayî nikarin bixînin destê xwe. Milîtanên PKK'ê xweser ji paş ve teqwiye distînin. Mewkiyên di destê PKK'ê de yên di dema cenga xeliçê de ji aliyê Sedam ve hatine çêkirin. Ew mewkî wek stargehên binerdê hatine amadekirin, ji ber vê yekê jî, li dijî bombeyan pirr saxlem in." Ev gotinên li jor ji aliyê kumandarê Tirk ê operasyonên başûrê Kurdistanê, Tuxgeneral Mete Sayar ve hatine îtîrafkirin. Her çiqas rojname û televizyonên Tirk ji bo kû terf-darên ordiya Tirk moral bistînin û dilê aligirên PKK'ê ji bi vî awayî ji tîkoşînê sar bibin, pesnê ordiya Tirk bidin jî, gotinên Mete Sayar baş dide xuyakirin ku serfiraziya dewleta Tirk, li hember gerîla wisa ne hêsan e û ordiya Tirk di rewşeke ne pirr

baş de ye. Li aliyê din daxuyaniyên gerîla jî, şubhên mirov der heqê nûçeyên rojname û televizyonên Tirk de zêde dike. Li ser berevajîkirina bûyerên başûrê Kurdistanê, Kumandariya Navenda ARGK'ê ji rojnameya me re ev daxuyanî şand: "Li herêmen Haftanîn û Xakurkê şer çêdibe. Balfirên cengê yên Komara Tirk, bombebaranên xwe dom di-kin.

Lê nûçeyên ku dibêjin Haftanîn û Xakurk ketine destê Komara Tirk, bi temamî derew in. Em dixwazin ku leşkerên Tirk bi nav hundirê başûr ve werin, lê ew bi pêş ve nayên. Ji ber ku ew dizanin pêştir ve werin, nikarin ji destê me bifilitin. Daxuyaniyên ku di rojnameyên Tirkan de dertên bi temamî, awayekî şerê psîkolojîk e. Komara Tirk derbên

mebesta veşartina vê tîkçûnê, raya giştî bi nûçeyên derew şaş dike û dixapîne." Wekî din çavkaniyên gerîla çend mînakên ji nûçeyên rojnameyên Tirk dide: "Piştî êrîşên PDK û YNK'ê her roj çapemeniya Tirk îdia dike ku kumandaranê PKK'ê tîne kuştin. Heta niha li gor nûçeyên wan Cemil Bayik û Murat Karayalçın du car, Osman Öcalan jî sê car hatine kuştin. Ew wan nûçeyan ji ber xwe ve çêdikin û tu bingeha wan nîn e. Lê weke ku me got, ev awayê şerê wan ê psîkolojîk e."

Li gor çavkaniyên gerîla, di 26 û 27'ê Cotmehê de du gerîla hatine kuştin dido jî birîndar bûn e. Eynî çavkanî dibêjin ku li nêzîkî sînorê Başûr û Bakur 13, li herêma Lolanî jî, di kemînekê de 27 leşkerên Tirk

hatine îmhakirin û 8 leşker jî bi pêlîkirina mayînan hatine kuştin.

## ROJNAMEVANÊ ALMAN

Li aliyê din, li gor nûçeyanê me yên Zaxo, li navenda bajêr 4 kes ji aliyê pêşmergeyan ve hatine girtin. Yek ji wan girtiyan rojnamevanê Alman Stephan Waldberge, yên din jî aligirên PAK'ê ne. Rojnamevanê Alman dixin zîndaneke Silêmaniye û bi sûcdarkirina alîkariya ji bo PKK'ê işken-ceyeke dijwar li rojnamevanê Alman dikin.

## PÊŞMERGE RÊBERIYA ORDIYA TIRK DIKIN

29'ê Cotmehê jî, birrek leşkerên ku xwestin bi ser gerîla ve herin, gerîla bi awayekî tund (sert) ew dan ber fişekan, 6 leşkerên Tirk hatin kuştin yên din jî paş ve zivirîn. Li gor çavkaniyên gerîla ordiya Tirk dixwaze xwe bigihîjîne hêzên pêşmergeyan û bi hev re bi ser gerîla ve herin.

Eynî çavkanî îdia dikin ku leşkerên Tirk bi rêberiya pêşmergeyan operasyonên

xwe didomînin.

## ÇARA DAWÎ: SERÊ PSÛKOLOJÏK

Şerê dewleta Tirk a li dijî PKK'ê ji warê leşkerî zehftir, di yê psîkolojîk de xurt dibê. Ev şerê ku dewleta Tirk, ji deh salan zêdetir e li hember gerîlayên PKK'ê dimeşîne her dem bi alîkariya çapemeniya Tirk dihat teqwiye kirin. Lê bi destpêka qerara "Mucadeleya Topyekun" çapemeniya Tirk vê desteka xwe gihande sêra herî bilind. Bi mebesta alîkariyê çapemeniya Tirk, tiştên pirr balkêş diafirînin. Nûçeyên ku ji xeyalên xwe çêdikin, hingî bi mubalexê û bêsînor in, ew ji aliyê dewletê ve jî car caran tîne redkirin. Helbet ev tiştên ku çapemeniya burjûwa dikin, giş ji bo şaşkirin û çewt agahdarkirina gelê Kurd û Tirk e.

Ev şerê psîkolojîk e. Baş diyar dibê ku, ordiya Tirk, li hember gerîla tîk diçe, ji bo veşartina tîkçûna xwe, bi alîkariya çapemeniya şovenîst, hêz dide şerê psîkolojîk.

## PÏLOT

### HEDEFA XWE ŞAŞ KÏR

Li gor agahdariyên ku ji Başûr digihîjin me, ordiya Tirk bi qeweteke mezin ketiye nav başûrê Kurdistanê, Lê newêre zêde bi nav herême ve here, êdî zehf bi balfiran bombeyan direşîne lê, ji tîrsa gerîla balfiran nikarin pirr nêzîkî erdê bibin, ji ber vê yekê jî car caran, bê hemdê xwe, bombeyan bi ser leşkerên xwe ve davêjin. Bûyereka dîsa roja 27'ê Cotmehê qewimî. Balfirên ordiya Tirk bombe reşandin ser çiyayên Manîn û Kaşxan. Ev bombe bi ser komandoyên Tirk de ketin û 9 leşker mirin, 30 heb jî birîndar bûn.

Balfirek jî, ji aliyê gerîla ve li hêla Beytüşcababê hate daxistin.

Dem a rojnameya me li ber çapkirinê bû, şerê li başûrê Kurdistanê hê jî dewam dikir.

## Serxwebûn nêzîk e

ROJEVA WELET

Şerê dewleta Tirk ê ku bi navê "Mucadela Topyekun" berî çend hefteyan li dijî PKK'ê dest pê kir, niha bi hemû hovîti û barbariya xwe ve dewam dike. Wek ji navê wî jî tê fêmkirin ev şer pirralî ye. Yanê ne tenê di warê leşkerî; di warê çapemenî, siyasî, dîplomasi, perwerdehî û hwd de jî tê meşandin.

Di dîroka Komara Tirk de, dewleta Tirk rastî gelek tevger û serhildanan hatiye û bi xwîn û qetlîaman ev tevger giş ji holê hatine rakirin. Lê tu car Komara Tirk pêwîst nedîtiye ku bi hêzeke wisa xurt û pirralî here ser wan serhildanan. Serhildanên herî bi hêz jî, mixabin, xwe ji du-sê mehan zêdetir li ber qetlîamên artêşa Tirk negirtine û piştî demeke kurt bi temamî tîk çûne.

Lê ev ji deh salan zêdetir e ku, dewleta Tirk li dijî PKK'ê şer dike û dawî mecbûr ma ku vî şerî bi awayê "Topyekun" bi hemû derfet û im-

kanên xwe ve bimeşîne.

Ev jî nişan dide ku ordiya Tirk a ewqas bi hêz û mezin li hember tîkoşîna PKK'ê bi serê xwe nikare şer bike.

Ji ber vê yekê dewleta Tirk, çapemenî, parlamento, nivîskar û profesor û hemû sazgehên xwe dan pey xwe û seferberiya şerê "Topyekun" da destpêkirin.

Îro, çapemenî û nivîskarên Tirk, ji ordiyê zêdetir dewleta Tirk diparêzin. Ji bo ku qelsî û tîkçûna dewletê neyê xuyakirin, çapemenî û televizyon ji ber xwe ve senaryoyan diafirînin, pesn û fortê ordiyê didin, şovenîzmê di nav gelê Tirk de belav dikin û hemû Kurdên welatparêz û bi taybetî jî gerîlayên PKK'ê wek eşqiya û terorîstan didin naskirin.

Çapemenî û televizyon, ji bo hêviya xelkê ji PKK'ê bibirrin her roj dibêjin: "Bi sedan gerîla hatin kuştin, ordiya me wê di nav du rojan de ge-

rîlayan îmha bike û hwd." Yanê li gor nûçeyên wan, diviyabû heta niha yek gerîlayek bi tenê jî sax nemabûya. Bes, êdî zehfên xelkê ji wan bawer nakin. Ne tenê gelê Kurd ê Tirk jî, ji van derewan bawer nake.

### PKK LI BAŞÛR JÎ DÏBE HÊVÏ

Tîkoşîna PKK'ê ya ku li hemû derên bakurê Kurdistanê şax daye û gelê Kurd bi xwe ve girê daye û daye pey xwe, niha li başûrê Kurdistanê jî bûye hêviya Kurdan û gelên din ên bindest.

Kurdên Başûr jî, êdî îxaneta PDK û YNK'ê dibînin û destek didin gerîlayên PKK'ê.

Pêşmergeyên Başûr jî, rastî û mafdariya tîkoşîna gerîlayan bi çavê xwe dibînin û naxwazin li hember wan şer bikin. Ji vêga ve hejmareke mezin pêşmerge dev ji PDK û YNK'ê berdane û alîkariya şervanên serxwebûnê dikin.

Ev rewşa nû ji bo serxwebûnê, hêviya gelê Kurd zêde dike û Kurdistan gaveke din nêzîkî serxwebûnê dibê.



# PKK di merhaleyeke nû de

Serokê Partiya Karkerên Kurdistan Abdullah Öcalan, mesajek ji hemû şaxên partiyê re bi rê kir. Hedefa PKK'ê ya nû, bi berfirehkirina serhildanên gel, bi çalakiyên milîsan, li hember avahiyên dewletê sabotaj û şerekî giştî û pirralî hatiye tesbîtkirin.

**Navenda Nûçeyan-** Serokê Partiya Karkerên Kurdistan Abdullah Öcalan, mesajek ji hemû şaxên partiyê re bi rê kir. Li gor mesaja Abdullah Öcalan, dê ji vir û pê ve, li hember êrişên KT'ê (TC) û hevkarên wê, PKK bi stratejiyeke nû wê şerê xwe bidomîne. Hedefa PKK'ê ya nû, bi berfirehkirina serhildanên gel, bi çalakiyên milîsan, li hember avahiyên dewletê sabotaj û şerekî giştî û pirralî hatiye tesbîtkirin.

Abdullah Öcalan vê pevajoya nû; ji bo şer stratejiyeke girîng û pêwîst di de xuyakirin û wiha didomîne: "Ev ji parastinê, derbasbûna mîzînê ye. Ji bo dijmin, ji şerê taybetî, derbasbûna şerê giştî ye. Ji bo me jî, ji parastina gerîla derbasbûna êrişên gerîla û serhildanên giştî ye." Li gor mesaja Abdullah Öcalan, dê ji vir û pê ve, li Başûr jî şerê gerîla dest pê bike. Öcalan di vî warî de jî wiha dibêje: "Eniya başûr

neyê xurt kirin, eniya bakur nikare tişteki zêde bike."

Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan, piştî tehlîleke dûvedirêj bal dikişîne ser xiyayeta Eniya Kurdistanî û wiha didomîne: "Pêşmerge naxwazin şer bikin, wan bi zorê dikişînin şer. Şerekî dûvedirêj, dê Berzanî û Telabanî ji xelkê dîr bixîne, wê di nav wan de dijberî derkevin. Ji ber vê jî, hemû hêviya xwe bi ordiya Tirk girê danc. Ger ordiya Tirk serfiraz nebe, wê bi temamî ji holê rabin. Ji ber vê yekê jî, li Başûr Eniya Serxwêbûn û Rizgariyê, rista xwe ya girîng, dê ji vir û pê ve pêk bîne. Ji ber vê jî, divê ev şer ne wek şerê PKK-pêşmerge, lê wek şerê xelasiya gelê Başûr bê nixandî. Em niha ji bo gelê Başûr gerîlayên wan û eniya wan ava dikin. Ji vir û pê ve xebatên siyasî jî girîng in. Li hember Eniya Kurdistanî gelek hêz û kes hene, emê ji bo yekîtiya wan bixebitin. Bi rastî jî gelek neyarên van



Serok Öcalan di mesaja xwe de dibêje: "Ordîya Tirk bikişînin Başûr û şerekî bi şiklê Lubnanî bidomînin."

xayînan hene; emê wan li hev bicivînin û bi vê jî Eniya Başûr ava bikin."

Abdullah Öcalan di mesaja xwe de, li ser şerê Bakur jî radiweste û wiha dibêje: "Dijmin bi hemû hêzên xwe yê bijarte ketiye Başûr û li wê teşhîr bûye, niha li Bakur gelek tiştên ku bêne kirin hene."

Di dawîya mesajê de, ev gotinên Öcalan hene. "Divê ji bo serfiraziyê her tiştê bê kirin, birêxistina ordiyê, rêxistina serhildanan

pêk were, ji bilî serfiraziyê rê li ber hemû ihtîmalan bê girtin."

Stratejiya PKK'ê ya nû, dikare bi vî awayî bê kurtkirin:

- Merhaleya parastinê tê temamkirin.
- Derbasî merheleya mîzîna stratejîk dibe.
- Parastina gerîla, dibe êrişên gerîla.
- Amadekariya têkoşînekê giştî tê kirin.
- Xebatên rêxistina ordi-

ya nû birêxistina serhildanan dest pê dibe.


- Dê PKK bi hemû hêzên xwe giraniya xwe bide Eniya Başûr.

- Li hember êrişan parastineke bi giştî.

- Dê ordiya Tirk bêhtir bikişînin Başûr û şerekî bi şiklê Lubnanî bê domandin.

- Dê li Başûr xebatên siyasî dest pê bikin.

- PKK, dê li Başûr bersiva êrişan bide û şerê gerîlayî pêş ve bibe.



Osman Öcalan

## Çapemeniyê 3 caran Osman Öcalan kuşt

Dîroka rojnamevaniya Tirk, li ser bingehên derew û nûçeyên asparagas hatiye avakirin. Li ser yek meseleyekê, di yek rojnameyekê de nûçeyên cihê cihê û ji hev dîr tene weşandin. Piştî ku derewên wan derdikevin jî, bi tu awayî li xwe danaynin û tu berpirsiyariya (mesûliyeta) rojnamevaniyê pêk naynin.

Her ku şerê li başûrê Kurdistanê, dest pê kiriye, di rojnameyên Tirk de derewên ecêb tene weşandin. Yek ji wan derewan jî, kuştina Serokê gerîla ye. Osman Öcalan ku Serokê gerîlayên Başûr e, ev cara sisêyan e ku di rojnameyên Tirk de tê kuştin. Cemil Bayık jî du car hate kuştin û roja din jî, ji bo rawestandina şer bangî Eniya Kurdistanê dike, piştî wî bi rojek jî, dîsa tê kuştin û her wiha didome.

## Rojnameya Cumhuriyet bi hezaran gerîla kuştin

Rojnameya Cumhuriyetê di hejmera xwe ya roja 28'ê Cotmeha 1992 an de, ji devê Serokê Artêşa Tirk Doğan Güreş, nûçeyek derxist manşetê.

Li gor nûçeya Cumhuriyetê, li Başûr bi hezaran gerîla ji alî artêşa (ordiya) Tirk ve hatine kuştin. Heta îro di rojnameyên Tirk de, bi hezaran nûçeyên wiha derew derketibûn. Lê weşandina nûçeyekê wiha bi sosret û bê bingeh, bû nesîbê rojnameya Cumhuriyetê. Bi vê nûçeya xwe, di warê "rojnamevaniyê" de ji rojnameyên din gavek bi pêştir avêt û ji wan re bû mînak.

### RÊHEVAL AYHAN (İLHAN ÇİFTÇİ)

Welat xweş e  
Te ji bo welatê xwe  
Xwîna xwe rijand  
Ew xwişk û birayên te  
Li pey te ne, tu meraq neke  
Xweş raze keleşa te li desta ye  
Em li pey te tên  
Silavên welat li ser te be  
Kurdistan ji te re pîroz be  
*Abdurrahman Çiftçi*

Weke tê zanîn, ev rojname, di van rojan de îflasa xwe xwestibû. Lê bi rastî Cumhuriyet ne di warê aborî de, lê di politikayên xwe de û di rastnivîsandina nûçeyan de, îflas kiriye.



# PÊNÛS



Amed Tigrîs

## Panel bû mehkemeka gel

Di roja 18.10.1992'an de, Komîta li Dijî Şerê Birakujîyê ji bo seknadina şerê nav pêşmerge û gerîla, li Stokholmlê panelek çêkir. Komîtê ji bo beşdarbûna panelê gazî Bereyê (Cepheyê) Kurdistanê Başûr, ERNK û hemû partî û grûbên Rojhilat û Bakur kiribûn û di panelê de, ji wan re mase hatibû veqetandin. Li ser navê Bereyê Kurdistanê yek ji Partiya Demokratî Kurdîstana Îraqê û yek ji, ji Yekîtiya Niştîman beşdar bûn. Du kes ji li ser navê ERNK beşdarê panelê bûn. Maseyên ku ji bo ew partî û grûbên Rojhilat û Bakur hatibû amadekirin vala man. Ji wan yek beşdar nebû. Paşê ji Rojhilat nûnerê Partiya Serxwebûn beşdarê panelê bû. Wî ji bi tenê çend pirs ji nûnerên Bere û ERNK pirsî.

**Pêwîst e li der welat û li her derî semîner, panel û civînên wiha di nav Kurdistanê de bîn çêkirin û hevkarên dagirkerên Kurdistanê teşîr û tecrît bibin. Ku ji çend salan carekê tarîxa Kurdistanê tegerar nebe. Kî çî ye û çî dîke bila eşkere û diyar bibe. Mehkemeyên gel bîn damezrandin.**

Panel bi axaftina nûnerên ERNK'ê dest pê kir. Nûnerê ERNK dîrok û pratîka Berzanî û Telabanî ya 30-40 salan ku bi teslimiyet û îxanetî hatiyê dagirtin anî zimên. Têkiliyên Celal Telabanî, Berzanî, Amerîka û Tirkîyê bi minakên berçav da diyar kirin. Koor-dînekirina şer ku çawa di nav Ber-

zanî Telabanî û Tirkîyê de hatiyê pêk anîn û birêvebirina wê de zelal kirin. Wî diyar kir ku PKK û PAK'ê dest bi şer nekirin. Tirkîyê û Berzanî-Telabanî bi piştgiriya Amerîka û dewletên Rojava sê heftene ku êrişên dijwar û giran tinin ser kampên PKK û PAK'ê. Berzanî-Telabanî û Tirkîyê di nav xwe de şer beş kirine. Ew bi jêr de û artêşa Tirk jî, bi jor ve êriş tinin ser kamp. Pêşmerge bi erdê re û Tirk jî, bi hewa re kampên PKK'ê bombe û gulebaran dikin. Şer ji aliyê gerîlayan ve derneketiye. Bi tenê ew xwe li hember pêşmergeyên Berzanî-Telabanî û leşkerên Tirkîyê diparêzin. Li berxwe didin. Me dest bi şer nekiriye. Ji me dixwazin ku em çek berdin û teslimê Tirkan bibin. Teslimbûn ne karê me ye. Ew karê serokên Başûr e.

Nûnerên Bere nîkaribûn ne dîtinên xwe bêjin û ne ji xwe biparêzin. Bi çend gotinên vala û klasîk nizanîm PKK Meclîsê nas nake, PKK ji nav axa me dernakeve, PKK bila dest ji çek berde, were derkeve jêrê Kurdistanê Başûr û ji xwe re li wir rojname û kovarên xwe derxe. Di radyo û TV'yên me de qise bike. PKK ne demokrat e. Xelk birçî ye, xwarin tune û hwd.

Dora axaftinê hat ser guhdaran. Gelek kes rabûn û axivîn. Ji derî du kesian hemûyan rexne li Meclîsa Başûr û biryara wê ya êrişkar girt. Bi taybetî Kurdên Başûr û Rojhilat gelek bi tûj û dijwarî li ser dîroka birakujî û îxanetê sekinîn. Danûstandinên Telabanî-Berzanî û Tirkîyê protesto kirin. Hema hema hemû axaftvan ji komîtê daxwaz kirin ku divê Meclîsa Başûr berî her tiştî tekiliyên xwe ji Tirkîyê bibire. Tirk nabin dost. Hemû dagirker nabin dost. Bila pêşmerge ne li dijî gerîla şer bike. Pêşmerge û gerîla bi hevdu re li dijî dagirkerên Kurdistanê şer bikin.

Nûnerên Bere şaş û matmayî man. Nizanibûn êdî çî bêjin û çî bikin. Her ku diçû salon li wan teng û tarî dibû. Yek rabû pêşniyariyekê da dîwanê û got ku:

Li her derê dinyayê tewandarê cengê hene. Tewandarên (sûcdarên) me ne tewandarê şerekî ne yên gelek şeran in. Wêk tewandarên şerê 1966'an, yên 1975 an. Yên 1979'an û yên 1992'an in... Ew ji Telabanî û Berzanî ne. Divê ew bêne cezakarî. Bi destê gel û di nav gel de!

Panel bû mehkema gel. Di dawîya panelê an ji mehkemê de, endamêkî Yekîtiya Niştîman êdî xwe negirt û êrişê nûnerê Yekîtiya Niştîman kir û qirîya:

Êdî bes e, ji cahşîti û xwefiroşîya we re! We, em perîşan û welêt ji wêran kir.

Pêwîst e li der welat û li her derî semîner, panel û civînên wiha di nav Kurdistanê de bîn çêkirin û hevkarên dagirkerên Kurdistanê teşîr û tecrît bibin. Ku ji çend salan carekê tarîxa Kurdistanê tegerar nebe. Kî çî ye û çî dîke bila eşkere û diyar bibe. Mehkemeyên gel bîn damezrandin.

# Zimanê Kurdî li Sorbonê

**Li Parisê, li avahiya Sorbonê (17; rue de la Sorbonne, 75005 Paris), Profesore bi nav û nîşan, Pierre Lecoq, ku berê xwendevanên Welat wî nas dikin, wê isal semînerên xwe bi navê lêkolînên li ser fonetîk û morfolojiya dîrokî yên zimanê Kurdî û zaravayên wê (Recherches sur la phonétique et la morphologie historiques du Kurde et de ses dialectes) bide. Semîner roja sêşemê, 17 Çiriya Paşîn 1992, dest pê dîke ra (ta) dawîya meha Hezîrana 1993. Xwendekarên Kurd ji hemû zaravan vexwendiyên van semîneran in.**

## Amed

Paris- Di navbera rojhilatnasan de gelek niwîstên xweş û nexweş li ser rola rojhilatnasiyê belav bûne. Hin dibînin ku rojhilatnasi ji koka xwe de meseleyeke siyasî ye, hinck vajayî wê dibînin. Em dikarin bibêjin ku parek ji rojhilatnasan rast bi roleke siyasî di warê rojhilatnasiyê de dixebitin; hinên wan ra (ta) dibînin amojkarên (misteşar) serokên dewletên xwe û wan ji hemû tiştî hayîdar dikin. Wekî dinê, pareke dinê jî heye kok (qet, hiç) karê xwe ji siyasê nîn e, tenê di warê zanistiyê de dixebite.

Kurdnasiya li Parisê bûye dûvê qantirê; ne dirêj dibe, ne kin dibe. Ev devedevî 50 salê Kurdnasi li Parisê, li Institut National des Langues et Civilisations Orientales-INALCO (Amojgeha Neteweyî ya Ziman û Şaristaniyên Rojhilat) heye, bêjî Kurdnasek jê derketibe nîn e. Giyanên Kurdnasên mîna Bazil Nikitin Thomas Bois û Roger Lescot li buhiştê be; camêran, nemaze herduyên paşiyê, Kurdî ji Kurdistan rindtir zanîn. Piştî van, Kurdnasi wêran ma. Helbet, egerê (faktor) siyasî rolê xwe tê de dilîze, ji ber ku zimanê Kurdî ne zimanê dewletekê ye; lewma kêmxwendekar bendewarên Kurdî ne. Lê, pirr ziman hene li INALCO ne zimanê dewleta ne, ne ji ewqas mîlet bi qasî Kurdistan pê dipeyvin, ne ji di warê siyasî de ji Kurdî girîngtir in, dîsa xebata wan ji ya Kurdnasiya Parisê pêştir e. Ji ber vê yekê, me rabû sala çuyî (1991-1992) ji Pierre Lecoq tîka kir ku isal bê (1992-1993) semînerên xwe li ser Kurdî bide.

Camêr pêşniyara me neşand û tavilê razibûna xwe nîşan da. Ji xwe berê camêrê profesore dostê gelê Kurd li nav Îrannasan hatiyê nas kirin. Em wî tim dostê xwe dibînin û ji dilê xwe wî spas dikin.

Profesore Pierre Lecoq, li Fransa, Îrannasekî navser (navdar) e. Îrannasiya wî bêtir di warê Avista de ye. Di nêzikayî de, ew ji wê wergerandineke nû ya Avista belav bike. Ji bo wergerandin û xwendina Avista, P.Lecoq pirr zimanê Hind-Ew-rûpî xwendine û dizane. Kurdî jî yek ji wan zimanan e.

Di semînerên xwe de, P.Lecoq wê bêhtir koka zimanê Kurdî bikole. Wê li ser hemû zaravên Kurdî werin vindandin (sekinandin). Hêja wê were balkişandin ku Camêr Pierre Lecoq ne mîna D.N. MacKenzie û dîvikên wî ye ku bêje: Ev zarava Kurdî ye, ê dinê ne Kurdî ye, hwd... Çi taybetmendiyên zarav û zaravçeyan hene wê werin şirove kirin. Ji bo vê yekê, gelek Kurdan ji hemû zaravên Kurdî û Kurdnasiya Parisê tevan haziriya xwe dane ku werin li semîneran amade bibin. Heçî Kurdên derveyî Fransa, em wan ji vedixwînin ku gotaran li ser zimanê Kurdî, taybetmendiyên wî, cudahiyan zarav û zaravçeyan wî, bi çî zimanî be, binivîsin û ji profesore re bişînin. Emê di semînerên xwe de li ser naveroka wan gotaran bisekinin. Çi xebata ku em bikin wê bi zimanê Fransîzî û Kurdî wekî pirtûkekê were belav kirin. Hevalên ku berhemên xwe bişînin, ew ji wê di pirtûkê de bi cih bibin.

Em hez dikin nimûnena nîşan din da ku xwendevan fikrekî li ser xebata ku dê bêkirin bistînin:

- 1) Gotina "şar" di Zazakî de (xelk) e, di Kurmanciya Jêrin û Jorîn de (bajar) e. Çend gotinên wiha di Avista de jî du watên xwe hene.
- 2) Pirtûka infinitif (mesder) di Zazakî de (ne=nuştene) û (iş=nuştîş) e; di Kurmanciya Jêrin û Jorîn de (in:nivîsandin) e.
- 3) Pirtûka mandê di Kurmancî de (dê) ye û (ê) ye; di hin zaravçeyên Zazakî de (da,do) ye.
- 4) Carna di Zazakî de tîpa (d) dikeve pêş êzafê (pirtûka nasandinê); ew ji ji pronoma relatîfa kevin hatiyê.
- 5) (k) a ku di zaravên Kurdî de derdikeve wekî; (lajek, key-nik, keçik, çelek, bavik, dostekan, hevaleke berxik) ji (k) ya Avista ya nasandinê û şirînkirinê hatiyê.
- 6) Di hin zaravçeyên Kurmancî de pirtûkeke mandê ya taybetî heye, wekî; ez ke bixwînim; di Zazakî de (ka, ko) ye. Lê hinek cudahî di demê de heye. Di zaravçeyê Kurmancî ya dinê de, pişka (kirin) bi kar tinin, wekî; ez dikim bixwînim.
- 7) Hin Kurmanc dibêjin: Min ji (li) bira kir; hin dibêjin: Min ji (li) bîr kir. Ew (a) ya hanê di Zazakî de heye, préposition e. Di Fransîzî de jî heye. Gava (a) bi

kar bê, gerek e (ji, li) bi kar neyê.

8) (pê) ya Zazakî di Kurmanciya Jorîn û Jêrin de (hev, hew, êk) e. (pê ji gotina (bi yew = bi yek = pê = pêk) hatiyê. Bo nimûne, pêkanîn, hevnanîn: bi yek anîn; pêkhatin=hevhatin, bi yek hatin; hatinê pê; hatine hev.

9) Di hin zaravên Kurmancî de, êzafeyêke dudiyê bi kar tê, wekî: Ez rind im= ez î rind im. Di hin zaravên Zazakî de jî wisa heye: Lînga min tewena= lînga min a tewena.

10) Yek ji taybetmendiyên Zazakî, Kurmancî û Soranî ev e: Tîpina gotinina hevwaterê di Zazakî de (m); di Kurmanciya Jêr de (w) ye; di ya Jor de (v) ye. Bo nimûne: Dim, dûv; kevan, kewan, keman; çim, çav, çaw; gav, gam; nam, nav, naw, dav, dam; havîn, hawîn, amnon; zava, zawa, zama; zivistan, zimistan; hwd...

11) Zazakî ji zaravên dinê bêtir nêzikî zimanê Avista ye.

12) Di hin zaravçeyên Kurmancî de, êzafeya nêr (î) ye; a mê (ê), wekî: bavî min, dêkê min, pozî wî, malê me; hwd...

13) Di hin zaravçeyên Kurmancî de gotinên dawîya xwe dengdara kurt in: (î); li zaravina dinê dirêj in: (î). Wekî: Merî=merî, serî=serî, derî=derî, herî=herî, bi mezîni=bi mezîni, bi kerri= bi kerri, hwd...

14) Gotinên hene li hin devêran mê ne, li cihên dinê nêr in, wekî; sîng.

15) Di Kurmanciya kasîk de û di zaravê Mukriyanî û Pijderiyan de, prépositiona (di) dikeve navbera êzafê û êpîtê, wekî: Hevalê di min; piyawî di paşa, babî di to, dankî di henarê, çêla di wî, hwd...

16) Di Kurdî de, sê tîp navgîniya dengdara dikin. H,y,w. Bo nimûne, bilindahî, kûrayî, tu wê binêrî. Di hin zaravên Kurdî de, di pişkan de (d) an (t) navgîniyê dîke, wekî: Min dayêye; min dayêde; min xisti bûyêye; min xist bûyêde; gerawimetewe; hatuwimetewe, hwd...

Ma em ji niha de hemwelatîyên xwe yên ku hez dikin beşdarî wê xebatê bibin spas bikin. Ew dikarin xebatên xwe li ser wê navnîşanê bişînin: Pierre Lecoq, Ecole Pratique des Hautes Etudes, 45-47 rue des écoles, 75005 Paris.





Mem û Zîn

Mustafa Delioğlu

# Mem û Zîn bûye dabaşa teza xwendevanekî Amerîkî

## Selmanî

California- Hevalekî me heye, bi xwe xelqê Amerîkayê, ku teza xwe der heqê Mem û Zînê de bi Îngilîzî nivîsiye. Navê hevalê me Michael Chyet (bi Kurmancî Mayko Çayet) e, û navê teza wî jî ev e: "And A Thornbush Sprang Up Between Them" (û diriyek navbeyna wan şîn bûye). Ev navê han, ji dawîya çîroka Mem û Zînê hat girtin: Piştî ku Mem û Zîn miribûn û di bin erdê de hatibûn veşartin, Bekoyê Ewan

yê xirab, Mîr Sêvdîn û Qeretajdîn yê ciwanmêr çûne goristanê. Li şaxeke xweş, ku li Ermenîstana Sovyetê hat berhevkerin, wisa gilî dikin:

"Mîr û Qeretajdîn, cindiyava çûne ser mexberê Memê û Zînêyî teze. Wexta derê mexberê vekirin, Memê û Zînê razane, kenê evîniyê li ser devê wan e. Bekoyê stuyê xwe dirêj kir, got: "Mîr, tu serê xwe kî, hila binhêr, qey tê bêjî razane." Wî wextî Qeretajdîn şûr avîte sutyê Bekoyê fesaad firand. Niqitkeke xûna wî dîsa pekiya orta Memê û Zînê, heta naka ji bûye dirike xirab. Hersal, çîqa rêwî wira diçin, jê dikin, dîsa şîn dibe." (Ordixanê Celîl, Celîlê Celîl. "Memê û Zînê (şaxa 1)" Zargotina Kurda= Kurdski Folklor (Moskova: Nauka, 1978), cilt 1, s.45-65)

Di berhema hevalê me Mayko de, ew hîjde şaxên Mem û Zîn yê zargotinê (folklorê) berhev dike, bi Îngilîzî werdigerînc (tercime dike) û tehlîleke dîr û dirêj jî zêde dike. Berhem serhev de nêzikî hezar rûpelan e.

Heval Mayko dibêje ku Mem û Zîn yê Ehmedê Xanî helbesteke wêjeyî (edebî) ye û ku hin ferqên girîng hene di navbeyna wê û yê zargotinê de. Kurdologên Fransî Joyce Blau û Roger Lescot (Lesko) jî navbeyna şaxên Mem û Zînê yê zargotinê û ya Ehmedê Xanî ferq dikin. Ji şaxên zargotinê re Blau û Lescot dibêjin "Memê Alan" û navê "Mem û Zîn" bi tenê ji bo helbesta Ehmedê Xanî bi kar tînin. Heval Mayko jî dibêje ku gava gelê Kurd dest pê dike "Memê Alan" bi tenê ji bo şaxên zargotinê bi kar binin, ewê jî wisa bike, lê niha, herçende ew bi xwe navbeyna van du hebûna cûdayetî dibîne, ew ji bona herduwan navê "Mem û Zîn" çêtir digire.

Lê belê, ramanekê din jî pêşniyar dike: Çîroka Xecê û Siyabend jî bi navekî din tê zanîn Siyabendê Silivî. Navê "Memê Alan" wek "Siyabendê

Silivî" ye. Navê gernasê (pehlewane) çîrokê yê nêr, bi hev eşîreta xwe re. Gelo nabe ku ev du çîrokên han xwediyên du navan bin?

Ji ferqên navbeyna Mem û Zînê Ehmedê Xanî û yê zargotinê herî girîng ev in:

a) Li helbesta wêjeyî, Mem ji xelqê Cizîra Botan e û Zîn jî wisa. Li hemû şaxên zargotinê jî, Zîn xelqê Cizîra Bohtan e, lê Mem xelqê bajarê din e. Navê bajarê wî yan Muxurzemîn e, yan Yemen e -nemaze li şaxên bashûrê (ango, Behdînan û Mehabadê, ji herêma Mehabadê û pê ve, çîroka Mem û Zîn li nav Kurdên Soranî ziman nayê gilî kirin- hiç nebe, tu şax nehatine berhev kirin heta niha!) Ji ber vê yekê, li şaxên zargotinê, beşekî çîrokê yê girîng heye, ku li helbesta Ehmedê Xanî qet nayê xuyanê. Rêwîtiya (siwarbûna) Memê Alan li ser piştê hespê xwe Bor (yan Bozê Rewa) jî bajarê xwe heta Cizîra Botan.

b) Ferqeke din jî zimanê çîrokê yê helbestkî ye. Berhema wêjeyî ya Ehmedê Xanî bi şiklê mesnewî, ango şiklê helbestkî yê wêjeya Farişî ya klasîkî, hat nivîsandin. Hemû riste (satir) bi du misreyan par dibe, bi pîvana hezec (fa-lun / me-fa- i-lun / me-fe-î-lun, yan -/\* -\*/\*\*--). Di her misreyê de, neh yan deh kîr (hece) hene û li navbeyna her du misreyên her ristekê, beşavend (kafiye) heye. Lê belê li navbeyna risteyan beşavend qet tune!

Li hemû şaxê zargotinê, hin risteyên helbestkî hene, lê pîrrianiya wan çîrokên bi pexşan (nesir) in, tev kilamin helbestekî li beşin taybetî, mesela gava Mem û Zînê re dipeyive. Şaxine din jî hene, ku serhevde bi helbestan tînan stran, lê ev helbestên han jî risteyên Mem û Zînê Ehmedê Xanî cuda ne; şiklê wan ne ye mesnewî ye; pîvanê tê de tune; riste bi misreyan par nabin; û navbeyna risteyan beşavend heye.

## Rewşa muzîka Kurdî

### Zana Farqînî

Iro civaka Kurd serûbinbûyînekê dijî. Yanî civak vediguhere. Tê de guherînen girîng çêdibe. Tevgera azadî dixwaze kirasê civaka Kurd ji bejnê bike û kirasek hemdem lê bike. Her wiha di hemû sazgeh û damezraweyê Kurdî de veguherîn pêk tînin.

Di hemû hol û qadên jîyanê de xebat tîne kirin. Ezê di vê nivîsa xwe de li ser xebata çandî rawestim. Bi taybetî jî li ser çalakîyên muzîkî. Îro gelek kom û kes ên ku bi Kurdî distirin hene. Gelek jî wan jî aliyên teorî û hêvotina (perwerdeya) muzîkê ve qels in. Rengê muzîka Kurdî jixwe qet baş nayê zanîn. Li ser vê yekê jî tu kê dileqînî behsa muzîka Kurdî ya hemdem û nûjen dike û berhemên xwe di wê kategoriye de dinirxînin.

Beriya her tiştî tu çalakî yê, çî yê çandî çî aborî, çî siyasî çî leşkerî û hwd. Tu tişteke jî hevûdin serbixwe nîn e. Bi hev û din ve giredayî ye. Îro di mercên (şertên) Kurdis-

tanê de divê tu xebat ji rewşa wê qetandî nîn be.

Jixwe kes û komên muzîkê yê pêşverû û şoreşger vê yekê rind dizanin.

Vêca em bînin ser rewşa muzîka Kurdî. Rengê muzîka Kurdî çî ye, harmoniya wê çî ye, çend meqamê wê hene, ritmên wê çawa ne, çend celeb hacetê muzîkê yê Kurdî hene û hwd. Mirov dikare van pirsan pîrr bike, û çîqas dîrî muzîka gelên Rojhilata Navîn e?

Taybetiyên wan ên ji hev cihê çî nin?

Ên nêzikî hev çî nin? Tesîra wan çîqas li ser hev bûye.

Tew em baş rengê muzîka xwe ya gelêrî û otantikî nizanin. Damezrewa dengbêjîyê jixwe hîc nayê zanîn. Ku mirov bersiva van pirsan (mîrov dikare pirsên di derbarê muzîka Kurdî de zêde bike) nizanibe, dikare bibêje ez muzîka Kurdî ya hemdem çê dikim? Hemdemîti peyvek nedîtbar e (soyut), reng û sînoren wê ne kifş e. Muzîka Kurdî jî aliyê naverokê ve an jî, jî aliyê teşeyê (formê)

ve divê bê nûjenkirin, ne xuya ye. Divê ev yek bîronî kirin. A din jî qey bêyî zanebûna rengê muzîka Kurdî nûjenkirina wê mumkun e? Bi ya min bersiv neyînî ye. Lewre xebateke zanistî ya li ser muzîkê bê binyat û bingeh çênabe.

Divê bê zanîn ku hemû xebatên qenc di demên şorêşê de tîne kirin. Çî jî aliyê wêjeyê (edebiyatê) ve çî jî aliyê muzîkê ve çî jî aliyê hunerê ve û bi giştî jî, jî aliyê çandê ve. Hemû berhemên nemir di demên ku îro civaka me tê de dijî de diafirin. Divê em vê rewşê baş bizanibin û fersendê jî çêstê xwe bernedin.

Bi rastî ku em bixwazin vê xebatê ankû xebata muzîkê bidomînin divê em xwe bi her awayî ve bigihînin û bersivê bidin pêdivîtiya (hewcedariya) gelê xwe. Tenê stranbêj nemînin. Heta dengbêj jî. Divê yê ku vî karî dimeşînin êdî bi çavê muzîsyeniyê li xwe binihêrin û lêgerîn û vekolînan li ser muzîka Kurdî bikin, reng û wesfên wê derxin ronahiyê.



# Cepha Kurdistanî Kurdistanê difiroşe

**Hasan Huseyîn Denîz**

Pêşmergeyên Cepha Kurdistanî, yên Telabanî û Berzanî bi biryara Tirkîye û Amerîka êrîşê dibin ser gerîlayên ARGK'ê û dibêjin "Ji xaka me derkevin." Niha em dipirsin, Ev xak ji ku ya we ye? We ji bo vê xakê çi keş kiriye? Ma ne hûn bûn yên ku ev xak bi deh caran firotin dijmînan? Ma ne hûn bûn yên ku ev xak terk kirin û hatin Amedê, Qiziltepeyê di qampên Tirkan de tîrîkê xwarin? We ev roj çi zû ji bîr kirin? Ma ne hûn bûn yên ku kirin gelê Başûr dan ser tixûbên Tirkî û ber tivingên Tirkan? Ma ne hûn bûn yên ku kirin gelê Başûrê wek çelîkên hehecîkan devê xwe li heva vekin ku Amerîka pakêtek xwarin ji wan re bavêje? We çi zû ev rev û xiyaneî ji bîr kirin?

## XIYANETA PDK'Ê NE NÛ YE

Xiyaneîta PDK'ê dûvedirêj e, ku mirov dest pê bike rûpel têrê nakin. Hîn di sala 83'yan de grûbên ARGK'ê yên derbasî welêt dibûn girtin û teslîmî dewleta Tirkî kirin. Dev ji vê berde, di nava xwe de bi xiyaneî gelek mirov kuştin. Sait Kırmızıtoprak û Sait Elçi bi destê PDK'ê hatin kuştin. Dîsa PDK ji PDK ya Îranê bi dehan pêşmerge bi xiyaneî kuşt. Di sala 91'ê de dema ku hêzên Amerîka ketibûn Başûr, pêşmergeyên PDK'ê berdevkiya wan dikirin û hîn wê demê riyên gerîlayên ARGK'ê qut dikirin û digotin "Çekên xwe bidin, teslîmî hêzên Amerîka bibin" dîsa hîn wê demê kemîn li

pêşiya gerîlayan vedidan û zêdeyî deh kesan bi xiyaneî kuştin. Bi dizî ketin depoyên gerîlayan û bi sedan çekên wan dizîn.

Dîsa em tev dîroka PDK'ê dizanin. Geh xwe difroşe Îran, geh difroşe Sovyet, geh difroşe Ewrûpa û îro jî xwe difroşe Amerîka û Tirkîye.

PDK bi devê dewleta Tirkîye û Amerîka, êrîşê dike ser gerîlayên ARGK'ê ku wan di navbera xwe û hêzên Tirkîye de qir bike. Baş e, ma gelê Kurd li hember vê xiyaneî wê bê deng bimîne? Gelê Kurd baş dizane ku yek hêviya wê ya rizgarbûnê hebe ew jî bi destê gerîlayên ARGK'ê ye. Ev xiyaneîkarên Cepha Kurdistanî ji xwîn, qirkirin û revê bêtir tiştê nedane gelê Kurd û îro jî berê gel didin nava agirê xiyaneî. Heta îro, bi destê xwe xiyaneî dikirin, niha dixwazin gel jî têxin nava vê pirika xiyaneî.

## ÎDÎAYÊN VALA

Temsîlkarê Telabanî û Berzanî yên li Tirkîye dibêjin, "Gel dixwaze ve-



Pêşmergeyên Cepha Kurdistanî bi ordiya Tirk re êrîşê dibin ser gerîlayên ARGK'ê.

gere ser axa xwe, lê PKK nahêle û ji ber vê yekê gel xwestiye li hember wan derkeve, meclîsa me jî biryar standiye ku em alîkariya gel bikin. Em meclîsek resmî ne." Ev derewa tewra mezin e. Ev axaftina bi devê dewleta Tirkîye ye.

Dema ku we bi hezaran gel tazî û birçî revî revî ajotin ser tixûbên Tirkîye, yê ku li gel xwedî derket, bi qamyonan jê re xwarin rêkir, qey ne PKK bû? Dîsa, yê ku depoyên xwe vala kirin û xwarina xwe dan gel ne gerîlayên ARGK'ê bûn. Ma gel vê rastiyê ji bîr dike? Ji bo ku gel bê ser axa xwe û nereve, xwe neavêje hembêza dijmin, qey PKK hindik xebat kir? Û yek din, hûn ji ku dibin "meclîseke resmî?" Ev resmîyet kê da we? Bi destê Amerîka resmîyet çê dibe? Bi xwarina ber devê Tirkan meclîs ava dibe? Hûn

kê dixapînin? Ew meclîsa we pîr pîr meclîseke biryara xiyaneî ye. Meclîsa we incax biyarên xiyaneî bigre. Ji wê meclîsê ji bo serxwebûn û azadiya gelê Kurd tiştê dernakeve. Jixwe hûn bi devê xwe dibêjin "Em serxwebûnê naxwazin. Tirkîye û Amerîka dostên me ne."

## AMERÎKA DOSTÊ KÊ YE?

Di vê cîhanê de Amerîka dijminê temamê gelên bindest e û Tirkîye jî cendermeyê wê ye tewra har e û dijminê gelê Kurd ê yekemîn e. Baş e ev hêzên wiha çawa dibin dostên gelê Kurd? Xuya ye tu jî weke wan dijminatîya gelê Kurd ji xwe re pesinvenêdanek dibînî. Ji te re pîroz be, ji ber ku wê aqûbeta Amerîka û Tirkîye bê serê te jî.

Gelê Kurd tev li hember vê xiyaneîta Cepha

Kurdistanî ye û bi dil û can dixwaze li hember vê xiyaneî bisekine û di refên Eniya Serxwebûna Kurdistan de cih bigre. Eniya Serxwebûna Kurdistan (Kürdistan Bağımsızlık Cephesi) li hember vê xiyaneîta Telabanî û Berzanî şer dike û di vî şerî de serkevtina ku bigre wê bibe serkevtina gelê Kurd yê daxwaza serxwebûn û azadiyê dike û di dawîya vî şerî de wê xiyaneîta bi destê van hêzên kevnarokî ji Kurdistanê rabe.

## TÊKILIYÊN XWESIPARTINÊ

Di êrîşên gerîla yên ser meqerên pêşmergeyan de têlsîzek Tirkî hatiye zevt kirin.

Û di nava refên pêşmergeyan de gelek serbazên (sûbayên), Tirkan hatine dîtin. Ev jî xuya dike ku ev êrîşa PDK 'ê bi alîkariya Tirkan û bi destê Tirkan bi devê Tirkan e. Jixwe Amerîka ji doh ve bi destê PDK û YNK'ê digire. Bi vê sedemê ve êrîşa ku diçe ser gerîlayan bi rastî bi destê Tirkîye û Amerîka diçe. Girîng e herkes vê baş bizanibe.

Gerîlayên ARGK'ê bi taktîkên gerîla berxwedanek mezin û şerek zanyarî dimeşînin. Serkevtina wan, wê bibe serkevtina gelê me û serkevtina gelê me wê bibe serkevtina gelên Rojhilata Navîn ku di bin destê Amerîka de dinalin.



Gerîlayên ARGK'ê xwe li dijî êrîşên pêşmergeyên PDK û YNK'ê diparêzin û êrîşî ordiya Tirk dikin.



# Paîz û Goran



Goran- Li kombûna  
Newroza sala 1954'an  
helbestan dixwîne.

Hozanê nemir, rewşenbîrê dildar Goran; di sala 1904 an de, li bajarê Helebçeya şehîd ji dayîka xwe bûye. Bavê wî Silêman Beg û kalê wî Ebdulla Beg jî şair û nivîskar bûne û bi zimanê Kurdî û Farisî berheman dane.

Goran, di zarotiya xwe de, li cem bavê xwe û li hin mizgeftan Quran dixwîne. Dû re, li dibistana fermî heta pola (sinif) 4 an dixwîne.

Di sala 1919 an de, mala wan talan dibe û di wê salê de bavê wî dimire. Di sala 1921 an de, di dibistana ilmî ya Kerkûkê'de, heta kuştina birayê xwe dixwîne. Bi kuştina birayê xwe yê mezin re ji neçarî dev ji xwendinê berdide, da ku bikaribe malbata xwe xwedî bike. Goran, di navbera salên 1925 û 1937 an de, li Helepçe û Hewramanê mamostayeti dike. Di sala 1937 an de, bi alîkariya Tewfîq Wehbî qlûbek ava dike. Di salên cenga cihanê ya duyemîn de, di radyoya Kurdî ya li Filistinê de kar dikir. Radyoya li Filistin, li dijî faşîzmê weşan dikir.

Di navbera salên 1951 an û 1958 an de, ji aliyê dewleta Iraqê ve gelek caran hate girtin û îşkence dît.

Bi şoreşa Iraqê ya 1958 an re, qedr û rûmeta wî bi-

lînd bû û di wê salê de bû endamê delagasyona milî û çû Yekîtiya Sovyetê, Çînê û Koreya Bakur.

Di payîza 1960 an de, Goran, li zanîngeha Bexdayê bû mamosteyê şîr û edebiyata Kurdî. Di sala 1959 an de, bû sernivîskarê kovara Şefek ku dawî navê wê kovarê guhert û kir Beyan. Her wiha, endamê redaksiyona rojnameya Azadî bû.

## HUNER Û HELBESTA GORAN

Hezonê nemir mamosteyê Kurd Goran, di sala 1962 an de, piştî nexweşînek dûvedirêj, di 18 ê Mijdarê de, li bajarê Silêmaniyê, giyana (ruhê) xwe dispêre xaka welat.

Mamoste Goran, bi zanistiya xwe û rengê helbesên xwe, mîna rexenegir, wergêr, rojnameger, nivîskar û têkoşerê ramyarî jiyana xwe borandiye. Ew bi baweriya xwe ya ilmê mar-

## Paîz

Paîz, paîz  
Bûkî pirç zerd,  
Min mat to zîz,  
Herdu hawderd,  
Min fremeskim, to barant,  
Min henasem, to baî sardît,  
Min xem, to hewrî barant,  
Dwayî naye, dadim dadît,  
Hergîz, hergîz,  
Paîz paîz.

Paîz, paîz  
Shan û mil rût,  
Min mat, to zîz,  
Herduk, man cût,  
Herçend gûl sîs debê bigrin,  
Polî baldar êfrê bigrin,  
Bigrin, bigrin shawman Nesrîn,  
Hergîz, hergîz,  
Paîz, Paîz

Goran

ksîzmê, reng û dirûveke nû daye helbestvaniya Kurdî. Ev di nav salên 1930 û 1940 an de dev ji arûza erebî, rengê kevin beridide û di helbesta Kurdî de, şoreşk diafirîne.

Têkoşîna Kurd û dimenên welat, di helbestên mamoste Goran de, bi awayek nûjen û bi zanistî tene ziman. Çend ji berhemên mamoste ev in: Geştî Hewraman 1933, Beheşt û Yadgar-1950, Fîrresk û Huner-1950. Pirtûka wî ya Fîrresk û Huner, li Swêd bi Kurdî û Swêdî hatiye çapkirin (1986).

# AZADÎ



Abdurrahman Durre

## Teyrê reş

Dibêjin, teyrek (perendeyek) hebûye, rengê hêkên wê reş bûye, yên hevalên wê jî spî bûne. Gelek ponijiyê (fikiriye), ku gelo çima rengê hêkên wê reş in. Gotiyê: Herhal ev hêlîna min ne rind e û bêyom e, ji ber vî jî rengê hêkên min reş tîn, diyê ez hêlîna xwe biguhêzim. Sala mayê cihê hêlîna xwe diguhêze, lê dîsa jî rengê hêkên wê reş tîn. Şaş dimîne, dibêje: Belkî ev cih û welat li min nayê, ezê salake din, herim li cihekî din hêlîna xwe çêkim. Ew sal jî dibore. Saleke din, ku bihar tê, diçe çiyayekî bilind, di dehlekê (daristan) de, dareke bilind hildibijêre û li ser wê darê hêlîna xwe çêdike. Şa dibe û dibêje: Ev cih cihekî pirr xweş û rind e, dê rengê hêkên min, li vir spî werin. Dema ku hêk dike, bala xwe didê ku rengê hêkên wê dîsa jî reş in. Kûr kûr diponije û dibêje: Heta ev qûn qûna min be, ez çî jî bikim, dê rengê hêkên min reş bin. Qebahet yê qûna min e, ne yê cih e û ne jî yê hêlînê ye, bêyomî ya qûna min e, ne yê tû kesî ye, hundirê min reş e, lewma jî hêkên min reş tîn.

Hikûmeta Tirkan û fermandarên wan jî, heta xweyê vê qûnê bin, bi vî mantiq û hişî bin, tucar, weke wê teyrika hêkreş hêkên spî nakin, wê tim bextreş, wextreş û nexweş bin. Dê hêkên reş bikin û çêlên reş derxin, karên reş û qirêjî bikin.

Xebereke pêşiyar heye, dibêjin: "Bi wî hişî, tu nagihîjî tu par û pişî." "Bi wê qûnê tu nagihîjî hêkerûnê." "Bi vê qûşê tu naçî Mûşê."

Di nivîsarên olî de jî, temsîlên wiha hene. Dibêjin: Mirov dema dimirin, bi mirina xwe nahesin. Dema ku ew dixine gorê, û piştî xwe didine wan, ew jî hêz didine xwe ku rabin, wî çaxî serê wan li kevir dikeve û hê bi xwe dihesin, dibêjin "Eywax... Li me bextreşan, em mirine" û hê bixwe dihesin. Mirovên zalim, faşîst û neheq jî, heta serê wan li kevir nekeve, bi xwe nahesin û hişê wan nayê serê wan.

Serê Demirel, heta niha çend caran li kevir ketiye lê mixabin hişê wî nehatiye serê wî. Belkî di dawî de, serê wî yê keçel, bi serê Erdalê dodîk re li kevirê dijwar bikeve û hişê wan rind were serê wan. Lê serê Demirel hem mezin û zexm e, hem jî hîn bûye. Belkî dîsa cilq bibe lê tişt pê neyê. Belê serê Erdal, weke hêka qulingan cilq bûye, ku li xîçekî jî bikeve, wê parçe parçe bibe û mejiyê wî di pozê wî re were.

## LÎ SER REWŞA BAŞÛR Û XIYANETA CEHŞAN

Çawa ku hûn hemû dizanin; li Kurdistanê, qelaxan ji kerme, sergîn û pesariyan çêdikin û bi rêxê sewax dikin ku bi wê rêxê ji berf û baranê bête parastin. Çiqas pirr bê sewaxkirin, qelax ewqas rind dibin.

Mirovên ceşş, xayîn û bênamûs jî, weke qelaxan in, çiqas bêne rêxkirin ewqas pê rind û pak dibin. Divê mirov devê xwe bi behsa wan pîs neke, wan di wê halê wan ê pîs û qirêjî de bihêle ku, bi xwe bibin rêx û bêhn bidin, weke qelaxên bê rêx, li ber berf û baranê bilewitin.



# Raşt ca ardena bingepersa<sup>1</sup>

## Lerzan Jandîl

Mordem ke, ziwane xo rind nezano, ebi ziwane xerib bifikiro, fikriyen u qesekerdene de u be gumannivisnayene de ji xele xelatiya keno. Hela eke ziwano xeribo ke, mordem pe fikirino, ziwane feqir, qels u be bingepersa, ze ziwane Tirkî bo, xelati u kemasi, sasî tayina benê zede. Sebete ke, domane Kurda verde Tirkî musê u ewro huna ji musene, mana persa, qesa u bingepersane xeriba bingepersa ke ziwane bina ra kewte Tirkî -an ji Tirkî ziwane bina ra gurete- ji ze Tirka musene. Demê ra dime ne domani bi girs. Wazene qese bikerê, binivisne, biwanê u her ci ra ver ji bifikirê. Ê baş... Hatani ita zametiye çinebiye. Zametiye nayê ra dime dest kena re ci. U her ci ra ver ji zametiye, waxto ke, ne Kurdî Kurdanê bina de, sare xeribi de qese bikerê, dina re binivisne, vecine werte. Ebi kilmiye eke ne Kurdî, kesane bina de, ye ke Tirk niye, qese bikerê, zametiye, sas famkerdene, kemasiye vecina wete. Na zametiye, sas famkerdene

yan ji qe fam nekerdene çiyede beqimet, çiyede qij niya. Ebi ne nivisi ez wazena balê niviskaranê Kurda boncê mesela persane xeribanê ke, Tirkî de este, ser. Ma ke wazeme ziwane xo zelal bikeme, be gumann gere ma persane xeriba, ne ze Tirkî, ze esasê/koka dina bimusime u binivisnime, çiyê ke, sere de sas ame musayene, rastkerdena de xele zamet a, xele oncena.

Serba nayê ji ez ne nivis de di bingepersa ser ro vindena. Gani her kes xo het ra, serba zeletiye ziwane ma, rastnivisnayena ziwane ma biguro.

1- Moral. "Moralê 2 min baş niye. Moralê min nîn e". Yan ji "moralê min xirabo. Moralê min çino". ûeb. mordem her roj nina, der u dorê xo de, heval u nasane xo ra heşneno. Serbeta ke mana ne bingepersî Tirkî ra niya ama musayene, her Kurd ji niya vano. Nayê de sas famkerdene çina. Tirk ji Kurd ji zano ke, ebi na vatene mordem wazeno vaco: "Kêfê min çino, kêfê min ca de niyo. "Serbeta ke, mana ke "moral"î Tirkî de gureta, "kêf" o. Tirk ji va-

no "Moralim yok", "moralim bozuk", yan ji "bugün çok moralsizim" Eke yew Tirkê de xirab nayê vaco, ez o waxt nayê zaf weş fam kena. Ez zana mana nayê çik a. La belê eke nayê yew Kurd- Kurdo zana, Kurdo ke, ziwani ser ro xebetino- vaco, bi raştiye ez neşikina nayê fam bikerê. Serbeta ke, mana Moralî "edeb", "ehlaq" u "terbiye" wo. Eke mordem vaco: "Moralê min çino", mana na vatena ebi taybetiye niyanên a. "Edeb-terbiye u ahlaqê min çino" Hela waxto ke Tirkî bi Elmani vanê; "Ich habe keine Moral" ti o waxt be diyar.

2- Sansûr. Tayê niviskari hurendiya nayê de "sensor" 3 nivisnenê ke, na zaf sas a. Raşt "sensûr" a. Waxt ke ma vacime: "Dewleta Tirkî rojname Kurdî sensor kena", mana nayê a wa ke, dewleta Tirkî rojname Kurdî kena memure sensuri. Yanê rojname Kurdî ciyanê bina sensûr kenê. Na ji serba rojname Kurdî neheqiyê de zaf girs a. Buglatêde zaf girs u be bingî ya. Se ke, ma pêro ji zanene, dewleta Tirkî bi xo sensor

a. A bi xo sensûr virazena, rojname Kurdî sensûr kena. La belê rojname Kurda çiyêda niya xirab nekene.

Tayê persî ji este, sas ene nivisnayene. Ez ita wazena balê niviskaranê kurdan boncine na mesela ser ji.

- Enstituyê 4 Kurdî. Enstituya Kurdan. Naca na bingepersa sas ena nivisnayene. Yane ze Tirkî. Raştiya naye "Institut" a. Yane Institutê Kurdî, instituta Kurdan. ûeb.

- Persê ke, koka xo ya bingehiye ebi "-gle" 5 xelesine, Tirkî de kerdê "-ji". Ma vacime biologie, psychologie, soziologie /so-ciologie, meteorologie/ mêtêorologie ûeb. Gani mordem koka ne persane ebi "ji", yanê ze biyolajî, psîholoji, ebi "gî" vaco u binivisno. Yanê biyologî, psîhologî, sosiyologî ûeb.

- Kanal. Xelê niviskari hurendiya kanali de "kenal" nivisnenê, Beno ke ne kesî bifikirê ke "kanal" Tirkî bo, serba nayê ji ne na perse biwurnê.

1- Kavram (lar)

2- Moral latini ra eno.

Philosophia moralis (filizofia moralis) mos. Fransi de ji "Morale" (moral eno wendene) wo. Elmani ji "Moral" o. Na bingepersa fransi ra kewta tirkî de teyana mana militeri de ena famkerdene.

3- Sensûr persê de latini ya "censura". Elmani de "zensur (sensûr ena wendene), Firansi de ji "censure" wa. "censor Lat.; "Zensor" Elm.; "censeur" fir. Mordemo ke, sensûr keno/ virazeno namê de wo.

4- Na bingepersa ji Latini ra ena u Latini de "institutum" a. Elmani u firansi de ji "institut" a. Tirka na perse Firansi ra gureta. Serbeta ke Firansi de "in" pironike de eno vatene u no veng vengêde wertê herfanê Tirkî "i" u "e" ye de ro. Tirkî persane niyanena, yane persê ke Firansi ra ame guretene u Firansi de ebi "in" dest kenê re ci, ebi herfa "e" ye vanê u nivisnenê. Çand persê bini. Emperyalizm= imperyalizm; enterese= interese; enterasyonal= internasyonal ûeb.


5- Persê ke, dawiya xo ebi "-gie, -gos" xelesine ziwane Yunani ra ene. Bio+logos; psyche+logos; socius+logos; meteroron+logos; paida+agogos.

## XAÇEPİRS

Amadekar: Rasto Zilanî

Çeperast: 1-Helbestvanê Kurd, di sala 1941 an de, li Qundaxsazê hatiye dinê. Du pirtûkên wî yê helbestan, bi navên 'Şiverê' u 'Kulîlkên Çiya' hene. Pirtûkek dramî jî, bi navê 'Sinco Qîza Xwe Dide Mêr' heye. Di wênê de tê dîtîn 2-Navçeyek girêdayî Mûşê/ Navekî Yewnanan 3-Mehek/ Li Rojhilata Navîn navê welatek/ Vexwarinek 4-Danasîn/ Gopal 5-Kinnivîsîna Doktor/ Desthelat/ Ji bo mîqrob bêne kuştin dikeve nav avê 6-Lîstikek 7-Hîmê bingehîn yê laşê mirovan/ Hiş 8-Weznek helbestî di edebiyata erebî de/ Notayek 9-Di notayê de dema seknê/ Navê qesabê Helebçeya Şehîd 10-Pakta Atlantîka Bakur/ Li Mezopotamya bajarvaniyek' kevin

Serejêr: 1-Aşiq/ Dema tê pêşiya peyvan, wê dike herî pîr 2-Qomutan/ Saziyeke Amerîkayê yê lêkolîna fezayê 3-Di olimpiyadan de, celebekî bazdanê/ Nebatek 4-Çiyayek agirî li Îtalyayê/ Navekî mêran 5-Roj/ Bîlhasa 6-Serwextbûn/ Bi Rûsî erê 7-Gulle/ Li Rojhilata Navîn navê welatek 8-Fûrandin, eko/ Koma aliman 9-Perê Japonan 10-Rojek/ Beyreq 11-ufq 12-Danek rojê



## BERSİVA XAÇEPİRSA HEFTİYA ÇUYÎ

Çeperast: 1-Cemşid Bender 2-Esnaf/ Ego/ Sê 3-Ma/ Ramyarî 4-Erk/ Dialekt 5-Derdest/ Nalî 6-Atom/ TÎR 7-Kî 8-İB/ Erzan 9-Bêhempa 10-TC/ DP/ Os Serejêr: 1-Cemedanî 2-Esaret/ BBC 3-Mn/ Kro 4-Şar/ DM/ Ehd 5-İfade/ Krep 6-Mîstizm 7-Beyatî/ Apo 8-Egal/ Rênas 9-Neron 10-İka 11-Es/ TL 12-Rêç

## KARTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara ..... pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

Bedelê abonetiye razînin:

Li Tirkîyê u li derve: Y. Serhat Bucak

İş Bankası Cağaloğlu Şub.

Döviz tevdiat Hesap No: 3113617

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin u tevli kopyeke pelê razandina bedelê abonetiye bişînin.

Navnîşana Welat: Başmusahip Sok. Talas Han Kat:4 No:16 Cağaloğlu /İstanbul

Tel: 511 57 60 - 511 66 02 Fax: 511 51 57

Mercên abonetiye:

	Li hundir	Li derve
6 meh	120.000	60 DM
12 meh	240.000	120 DM



# Em bi hev re hîn bibin

Roj baş!

Ez ji bo we hîn bûm û dibim.

A niha jî emê tev hîn bibin û hîn bikin.

Hevalê Zarokên Serhildanê

## Navên van binivîse



## ALFABE (Alfabeya Kurdî 31 tîp in)

Tîpên mezin

A B C Ç D E Ê F G H I Î J K L M N O P Q R  
S Ş T U Û V W X Y Z

Tîpên biçûk

a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z

Ji van 23, tîpên bêdeng in:

b c ç d f g h j k l m n p q r s ş t v w x y z

Ji van 8, tîpên dengdar in:

a e ê î o u û

### Tîpên alfabeya Kurdî çawa tên xwendin?

Aa - av	Îî - îsot	Ss - sêv
Bb - bîzin	Jj - jûjî	Şş - şêr
Cc - cawbîrr	Kk - ker	Tt - tawe
Çç - çav	Ll - legleg	Uu - ûfî
Dd - dest	Mm - masî	Ûû - ûr
Ee - enî	Nn - nan	Vv - varik
Êê - êzing	Oo - ordeq	Ww - werîs
Ff - fil	Pp - pisîk	Xx - xanî
Gg - gore	Qq - qijik	Yy - yek
Hh - hesp	Rr - rovî	Zz - zirne
li - lincas		

### Tîp û hevok

Ee - Ez: Ez Kurd im	Uu - Ufî: Ufî rast dike
Êê - Êzing: Êzing hişk in	Ûû - Ûr: Ûrê mangê tijî ye
li - lincas: lincas şîrîn in	Ww - Werîs: Werîs dirêj e
Îî - Îsot: Îsotên tûj hene	Xx - Xanî: Ev xanî nû ye
Qq - Qijik heywan e	

### HEYWAN (Heywanên navmalî (kedî) kîjan in?)

Dewar	Heywan	Gîsk
Mange (çêlek)	Mîh	Mirîşk
Ga	Beran	Keleşêr
Golik	Berxik	Varik
Mînik	Belindir	Çêlika mirîşkê
Nogin	Kavir	Dêlik
Boxe	Hogeç	Kûçik
Cange	Bîzin	Cewrik
Gamêş	Nêrî	Pisîk
Mehîn	Karik	Çûk
Hesp	Tişfir	Kevok
Canî	Bîzaşfir	Dûvmeqesk
Manker		
Ker		
Kurî		
Qantir		

## Navên van binivîse




## Ev çi ye?



Hinek mirov baş nabînin  
Ji ber vê jî li ber çavên wan  
tişteke heye.  
Ev tişt ji plastîk û camê ye.  
Renge reng in,  
Biçûk û mezin in.

Navê min ..... e.



Hûn min berî xwarinê û piştî xwarinê bi kar fînin.  
Ez renga reng im. Biçûk û mezin im. Eger ez  
nebin, destên we paqij nabin.

Navê min ..... e.

## Bersiva van pirsan bide

Bersiva rast di nav parantêzê de îşaret bikin. ( x )  
Bersiva van pirsan hefteyeke din wê di vê rûpelê  
de be.

1- Tu di kîjan demsalê de lepikan bi kar fîni? 4- Tu di kîjan demsalê de  
goreyên rêsinî pê dikî!

a) Bihar	( )	a) Bihar	( )
b) Havîn	( )	b) Payîz	( )
c) Zivistan	( )	c) Zivistan	( )
d) Payîz	( )	d) Havîn	( )

2- Tu di kîjan demsalê de kum didî serê xwe? 5- Di kîjan demsalan  
de berf dibare!

a) Payîz	( )	a) Bihar	( )
b) Bihar	( )	b) Payîz	( )
c) Havîn	( )	c) Havîn	( )
d) Zivistan	( )	d) Zivistan	( )

3- Tu di kîjan demsalê de stûpêçê girê didî? 6- Serê salê di kîjan  
demsalê de ye!

a) Havîn	( )	a) Havîn	( )
b) Payîz	( )	b) Zivistan	( )
c) Bihar	( )	c) Bihar	( )
d) Zivistan	( )	d) Payîz	( )



# 'Divê civata navneteweyî alîkariya Kurdan bike'

Iro li parlamentoya Norwecê bi navê 'Destbiratî ji bo Kurdan' grûbek heyê. Hûn ji kerema xwe re dikarin ji me re bibêjin, ka ev grub kengê û çima hat damezrandin?

—Grûba destbiratî li meclîsê di sala 1991 ê de di meha Nîsanê de piştî konferanseke navneteweyî, ku li bajarê Stokholmê ji bo Kurdan hatibû çêkirin ve hat damezrandin.

Armanca damezrandina vê grûbê lêkolînkirin û rêlêgirtina wan bêmafî û sitembariyên, ku li dijî gelê Kurd çêdibin e.

Hêviya me ya herî mezin ew e ku em bikaribin pirs-girêka Kurdan bînin nav dezgah û sazgehên navneteweyî. Divê pirs Kurdan bikeve rojê sezgehên navneteweyî.

Gelo di kenveşopiyên we de ev tiştêkî normal e ku di meclîsa we de qomîteyên wiha tên li darxistin?

— Di meclîsa me de grûbên destbiratî yên ji bo Tibetê, Komarên Baltikê û Îsraîlê jî hene.

Armanca we, grûba Kurdan a herî mezin çi ye?

— Ez dikarim armanca me di çend xalan de şîrove bikim ku ew bingehê xebata me jî pêktînin.

a) Divê em bi awayekî wisa bixebitin da ku gelê Kurd bikaribe li wan welatên ku tê de dijî, di aştiyê de çand û zimanê xwe biparêze û wan pêş ve bibe.

b) Divê rewş û pirs-girêkên Kurdan di konferansên navneteweyî de bi dorfirehî bînin lec (munaqêşe) kirin. Karên wiha jî divê di bin çavdêriyên Neteweyên Yekbûyî (NY) de bînin afirandin.

Divê dewleta Norwecê di NY'ê de ji bo munaqêşe kirina pirs-girêka Kurd, bibe xwediyê inisiyatîfê.

c) Di munaqêşe kirina rewşa Kurdan de parastina mafên mirovan bingeh in.

Gelo hûn gihîştin armanca xwe ya ku di destpêkê de we hêvî dikir?

— Na, em hêjî negihîştine armanca xwe. Lê em ji bo vê, xebata xwe didomînin. Di vê babetê de têkiliyên me yên xurt bi hikumeta Norwecê û



Piştî şerê Xelîcê li meclîsa Norwecê grûbek, ji bo ku alîkariya Kurdan bike, hat damezrandin. Di vê grûbê de ji hemû partiyên endam hene û serokê wê jî endamê partiya gundiyan (centerpartî ku ji aliyê bîrdozê ve di navçeyê de ye), Tove Kari Viken e. Me ji bo rojnameya Welat bi Tove Karî re der heqê xebata wan de hevpeyvînek çêkir.

hin sazgehên din re hene. Me bi hikumetê re gelek caran pirs Kurdan munaqêşe kiriyê.

Sala par (çûyî) min pêşniyarek anî meclîsê, li wir gelek tişt bi dorfirehî hatin munaqêşe kirin. Par havînê jî ez nûnêra Norwecê yê NY'ê bûm. Min li wir jî pirs-girêkên Kurdan anîn ziman û ez bi hemwelatîyên xwe re li ser vê axivîm.

Norwec li ser rewşa Kurdan çawa difikire û bi çi çavî li xebata we dinêre?

— Gelê Norwecê agahdarê

rewşa Kurdan e. Gelê me xebata me dipejirîne. Li ser vê me gelek nîşanên pozîtîf girtin.

Li meclîsa neteweyî em ji hemû partiyên pişt-girîyeke bi dorfirehî digirin. Ji 165 nûnêran, ku tevahiya nûnêran di meclîsê de ne, 60-70 yî bi destnîvîsên (îmzeyên) xwe alî-girîya me dikin.

Peywendiyên (têkilî) we bi têkoşînê, ku Kurd ji bo rizgariya xwe didomînin, wek Partiya Karkerên Kurdistan (PKK) û Partiya Keda Gel (HEP), çawa ne?

— Li ser PKK ê dîtinên cûr be cûr hene.

Pirraniya nûnêran ew terorrê, ku li dijî gelê Kurd ji aliyê dewletên wek Tirkiyê û Îraqê ve tê ajotin, dieyibînin (protesto dikin).

Lê êrîşa li ser balyoza (qonsolosa) Tirkiyê ya li Osloyê jî nehat pejirandin. Ji ber ku li Norwecê êrîşên wiha rûmeta doza Kurdan li ba Norweciyan xera dikin.

Têkiliyên we bi desthiladên Tirkiyê re hene?

— Belê, em bi balyozê Tirkiyê ya li Norwecê re axivîm.

Me nameyek ji serokê meclîsa Tirkiyê, Hüsametîn Cindoruk re bi rê kir. Me qopiyên wê nameyê jî, ji hemû serokên wan partiyên, ên ku li parlamentoya Tirkiyê ne re şandin.

Di nameyê de me rewşa Kurdan a îroyîn anîye ziman û wan bêmafîyên ku dewlet li dijî HEP'ê û nûnêrên wê dajo me protesto kiriyê. Gelo, hikûmet û dadgeh çawa dikarin wan mafên endametiye, ku gel daye nûnêran, jê bistîne? Divê HEP ji xwediyê wan mafan, ên ku partiyan din girtine be û di şertên wekhev de beşdarê hilbijartinan bibe.

Desthiladên Tirkan di pîrozbûna Newrozê de li bajarê wek Cizîrê xwîn rijandin û niha jî cîranê wê Şîrnexê bi bombebaran hilweşandin. Gelê Şîrnexê niha bi tevayî di koçberiyê de ye. Gelo qomîteya we li ser van bûyeran çi kir û ji bo vê jî di bernameya we de çi heyê?

— Belê, ev rast e ku bûyerên wiha pêk tên. Em hê li ser van bûyeran yek bi yek mijûl nebûne. Lê me di gelemperiyê de dewleta Tirk li ser perçiqandina mafên mirovan û kotekiyên wê yên li ser gelê Kurd rexne kirine û dikin jî.

Hûn bixwe çawa û çima bi pirs Kurdan mijûl bûn?

— Ez li Oppdalê, ku bajarê min e, ji aliyê penaberên Kurd ve agahdarî mesela Kurdan bûm. Ez bixwe gundî me û gundê min di quntara çiyayekî de ye. Li ba min çiya nepenên pirr mezin diafirînin. Ji ber vê yekê ez kesaniya xwe bi gundiyan Kurdan ên çiyayî re yek dibînim.

Li gor min îro ev bêşermîyeke mezin e ku civata navneteweyî alîkariya Kurdan nake. Ji bo vê yekê, divê em xebateke hêja ji bo Kurdan bikin da ku civata navneteweyî di rêza yekemîn de zorê bide dewleta Tirk, Îraq û Îranê.

Ji bo hevpeyvîne em spardariya we dikin.

— Ez jî, ji bo xebata we serfirazî û serkevtinê dixwazim.

**Hevpeyvîn:**  
**Gavan Koçer**

• Li ser navê ÎMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar • Mudurê Dezgahê (Müessese Müdürü) Zübeyir Çakar  
• Berpirsiyarê Giştî (Genel Yayın Yönetmeni) Abdullah Keskin • Berpirsiyarê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat  
• Navnîşan (Adres): Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Kat:1 D. 4 • Cağaloğlu / İstanbul • Tel:511 57 60 - 511 66 02  
• Fax: 511 51 57 • Berpirsiyariya Ewropa • Postfach: 1531, 5300 Bonn 1, Germany • Tel: (49) 228-630990 • Fax: (49) 228-630715  
• Berpirsiyariya Fransa: Amed Jemo • Rua G-401 92763 Antony Cedex France  
• Çapkirin (Baskı): Metinler Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım): Birleşik Basın Dağıtım AŞ